


Apê Musa:

**Dengê hiş,
mejî û
wijdanê**

Rûpel 16



Kurdên Komarên Sovyeta berê di navbera xwe de li Grasnadarê komele ava kirin

Li Sovyeta berê yekîtiya Kurdan

Di navbera 1-5'ê Îlonê de konferanseke pîr girîng li Grasnadarê pêk hat.

Ji Komarên Federasyona Rûsya, Kazakîstan, Azerbeycan, Gurcîstan û Ermenîstanê 47 delegeyên Kurd wek nûnerên Kurdên van komaran li hev kom bûn. Di konferansê de li ser problemên Kurdan yê siyasî, aborî, çandî û hwd. hate rawestîn û biryarên hevpar ji bo çarserkirina pîrsgirêkan hatin standin.

Delegeyên Kurd ên bijarte bi awayekî yek-deng piştewaniya xwe ji bo şerê serxwebûn û azadiya Kurdistanê diyar kirin. Konferansa Komela Kurdên Sovyeta berê, rewşenbîrê mezin doktorê zarokan Prof. Dr. Seîdê Îbo, wek endamê Komîteya Navendî ê Rûmetê bijart.



Kurdên ji Komarên Sovyeta berê, her diçe dengê xwe bilind dikin û di riya yekîtiyê de gavên girîng diavêjin.

DEP hedefa dewletê ye



Dewlet kampanyaya DEP'ê ya "Aştiya Topyekûn", bi geşkirina şerê qirêjî, kuştina Mehmet Sincar û endamên DEP'ê û bi girtina Yaşar Kaya bersivand. Dewlet bi vê tewra xwe diyar kir ku, li hember xwe û qetlîamên ku dimeşîne tu dengên muxalîf naxwaze. Tewra DEP'ê, sazî û komeleyên demokratîk, hêz û rêxistinên sosyalîst û rewşenbîran, ji vê pê ve girîngtir dibe. Divê li dû politikayên rast di nav hemû hêzan de yekîtiyek bê avakirin. **Rûpel 9**

Li Sîlvriyê hevpeyvîn bi karkerên acûrê re

Kî dike, kî dixwe!..



Bawer nedikirin ku, em rojnamevan in. Ji me nasnameyên rojnamevaniyê xwestin. Di destê me de jî rojnameya Özgür Gündem û Welat dîtin, paşê hinekî ber bi me ve hatin û germiyek kete navbera me. Tirsê wan ew bû ku, bi hatina me re xwediyê kargehê wan ji kar biavêje. Her wekî digotin "Wê bibêjin hûn giş PKK'van in, hevpeyvînan ji rojnameyan re dikin" Piştî vê daxwaziya wan me jî nasnameyên xwe yê rojnamevaniyê nîşanî wan da. **Rûpel 6**

Şehadeta Musa Anter

Bedena Musa Anter, gava hewcetiya Kurdistan û tarîxa mirovatî pê hebû, şopa xwe hişt û çû. Şehadeta wî, ji bo dayika Kurdistanê bû nêzeke mezin. Pênûsa xwe ya wek xençer di çavê neyaran de diçikand û ji wan re wiha digot: "Lawo, Tirkino, faşîstino, wehşino, hûn qenc fêm bikin, heke xwîna şehîdên me û oriya şehîda me ya muqades li erdê bimîne, lenet li me Kurdan hemûyan bê."

Apê Musa bi van gotinan ji bo Rahşan Demîrel ku, canê xwe ji bo gelê Kurd feda kiriye re digot û wiha

dom dikir:

"Min ji we hemûya qebûl e. Ez nikarim yek yek bersiva we bidim. Newroza we gişan pîroz be, bila agirê meşala Rahşan Demîrel, li pêşiya we pêketî be." Em jî soz didin ji xalo re (ji te re) eşqa te welat bû; meşala vê eşqa te bilind kir.

Em Kurd, ji bo xwîna te û ji bo rizgariya neteweyî heya ku, dilopek xwîn di me de hebe li ser rêka te herin.

Mamoste Anter; hûn he-defa guleyên neyaran bûn, lê belê di nav axên dayika Kurdistanê de, weke we bi hezaran dergûş çavê xwe di

nav xwîna şehîdan de vedikin. Wê ev dayika adanî bi hezaran zarok bîne dinyayê û bi sedan jî wê şehîd bide. Çiqas şehîd bide wê ewqas jî bi ber zêde bibe. Ev xwîn û can ji bo dayika me ya delal wê bibe tov. Tu hêz nikare rê li şînbûna tovan bigire, bes av bidin, ji dayika Kurdistanê re sonda dayikên Kurd ew e ku, di şûna her zarokên wan ên şehîd dibin de, bi hezaran zarok bînin dinyayê.

Ev sonda hanê nayê şikandin. Lewre sonda me şerefa me ye.

Dilbirin

Nivîsara Welat

Xwediyê quncikê 'TÎR'

Ev bû salek ku Apê Musa bi bedena xwe ne di nav me deye. Di salekê de der heqê wî de pîrr tişt hatin gotin û nivîsandin. Me quncikê wî yê di Welat de 'TÎR', piştî şehîdbûna wî jî ranekir û hin nivîsên wî yên neweşandî û yên xwendevanên me ku li ser nivîsandibûn tê de derxistin. Quncikê 'TÎR' çend hefteyên din jî wê di Welat de cih bigire.

Bi rastî, nivîs û helbestên ku der heqê Apê Musa de ji me re hatine, hîn gelek in di destê me de, lê em pêwîst nabînin hemûyan di 'TÎR' de biweşînin. Me piştî şehîdbûna wî, wek wezîfeyek dît ku em pêvajoya salekê şûna pênûsa wî vala nehêlin.

Helbet, ji vêga pê ve jî, ne di quncikê 'TÎR' jî de be, wê di rûpelên Welat de li ser Apê Musa gelek tişt bînin nivîsandin. Ne tenê kurtenivîs, gotar û helbest; nivîsên dirêj, pirtûk û gelek berhemên din jî wê li ser Apê Musa derkevin holê. Ji ber ku nasîn û danasîna wî ji bo me pîrr girîng e. Wî jî pêncî salan zêdetir di riya rizgarî û azadiya Kurd û Kurdistanê û mafên hemû gelên din de bi her awayî têkoşîneke birûmet domand û di vê doza bişeref de canê xwe da.

Hêjabûna Apê Musa bi nivîsandinê xelas nabe; mirov çiqas bibêje û binivîse hindik e. Di dema ku kesî newêribû peyva Kurd bîne zimên, wî serê xwe û canê xwe ji bo rizgariya gelê Kurd û Kurdistanê êşandiye û derdora xwe ronahî kiriye. Dema ku kesî di mala xwe de newêribû bi Kurdî bipeyive, wî pirtûk bi Kurdî nivîsandine û di kovaran de gotar û serpehatiyên bi Kurdî weşandine. Ji ber van kirinên xwe, di nezaret û zîndanên de tade, îşkence kişandine. Ji taybetiyên wî yên herî girîng yek jê ew bû ku tu car jî gelê xwe dûr nediket. Çi li Kurdistan çi li Tirkîyê herdem ew di nav gel de bû.

Aliyekî wî yê din ê girîng jî cesareta wî bû. Wî gelek qetlîam dîtibûn. Ew şahidê gelek neheqî, zordarî û pêkutiyên dewleta Tirk bû. Di wê demê de pîrraniya Kurdên xwende û xwedêgiravî rewşenbîr, ji ber helwestên dijwar yên dewleta Tirk tirsîyan, melisîn û dev ji her cure lebatên welatparêzî, şoreşgerî û mirovî berdand, li mala xwe rûniştin. Lê Apê Musa tu car serî li ber zilm û zorê ne tewand, cesareta xwe qet wînda nekir û dev ji hêviya ji bo serfiraziya gelê Kurd berneda.

Kurd û Kurdistan di dilê wî de kuleke giran bû. Gava behsa hovîti û wehşetên ku dewleta Tirk li Kurdistanê pêk anîbûn dikir, xwe nedigirt, hêstirk ji çavên wî dihatin xwar, lê ji nişka ve têkoşîna ku îro li Kurdistanê tê dayîn dihatê bîra wî û pê re pê re çavên wî jî kêfa dibiriqîn. Dû re wiha digot: "Lawo, min ev roj jî dîtî, êdî ez bimirim jî ne xema min e. Ji ber ku va zarokên me gihîştine û rizgarî nêzik bûye. Êdî xwediyê malê şiyar bûye û diz girtiye."

Em jî dibêjin. Belê, Apê Musa rast e, xwediyê malê bi rasti jî şiyar bûye û nema diz dikare ji destê wî xelas bibe. Wê gelê Kurd diz û kedxwarên welatê xwe yên hezar salan hişk girê bide û maf û malê xwe ji wan bistîne.

Bila dilê te rehet be Apê Musa.

Şehîdê heştê salî

Ho şehîdê heştê salî
Lê mixabin, sed mixabin
Şoreşgerê xamê zêrîn
Me berze bû.

Rewşa riviştê rojnaman
Rewşena rewşenbîran
Hêj ne çax û dema te bû.

Gelê hejar û perîşan
Pênûs û dîroka Kurdan
Hêj pêdiviyê mana te bû.

Rêziman û rêzana Kurdî
Çiya û kevir û berên erdî
Çav li riya dengê te bû.

Lê ew mohra di dîrokê de nîgar kirî
Ji tovên heyvê ronahiya xamê te bû.

Lê ew ala xwe xemilandî
Rengê kesk û sor û zerî
Ji sipelên xwîna te bû.

Me nedizanî tu yê kal î
Ber çavên me çardeh salî
Xwedan kavlan û keval î
Di nav dijminan de
Dilê şêra dilê te bû.

Çima kuştin pîremêrê heştê salî?
Herê gelo guneh ne bû?

Herê
Erdal û Demîrel, Özal
Ma ne şerm bû?

Pîremêrek ser spî wek Enterî
Ne henkûfê kerb û kîn û gula we bû.

Lê çi kiribû? Lê çikiribû? Lê çikiribû?

Mamê Anter.
Berevanê doza xwe bû
Zêrevanê koza xwe bû
Xakperêstê soza xwe bû
Mamê Anter.

Her gencek lê dilîstanê
Her zeryek ji gulîstanê
Her çar parçên Kurdistanê
Şahî û şahyan tev rawestan
Şanazî ya behya te bû.

Mamê Anter tu nemir î
Her dê mîna agir û gurr î
Lê Kurdistan mergê te bû.

Hedar Hekarî

Wesiyeta Apê Mûsa

Li ser rûyê gerdûnê neteweyek xwe bi çi awayî dide pejirandin? Bi baweriya min bersiva vê pirsê wiha ye: Mercên neteweyetiyê berî her tiştî xwedî lêderketina ziman, çand û kesaniyên xwe yên mezin in.

Li gorî îro em nikarin bibêjin, em van mercan bi serbilindî tînin cih. Ji lew re di vî şerê germ û dijwar de em xwe li gorî şerê neteweyî pêk naynin. Bi kurtayî bibêjim, em li xwe xwedî demakevin.

Gelê Kurd jî sala 1990'î vir ve li Nisêbînê, Cizîrê, Amedê û li derên din bi serhildan û dîlanan ve şehîdên xwe binax dikirin. Lê dagirkeran ev bidestxistina Kurdan gelek zêde dît û bi pest, zilm û zora giran ve hate ser gelê me. Êdî welatparêzan dikujin û direvînin. Bi zindî wan vedîşêrin.

Mixabîna mezin Apê Mûsa jî wiha hate binaxkirin. Dagirkeran li bajarê Amedê ew kuştin û ji cendekê wî jî tirsîyan. Bi lez û revê ew anîn li Zivingê binerd kirin. Dera ku niha lê veşartiyê ez xemgîn kirim. Tirbeya yekî wekî Apê Mûsa çawa di nav lingên pez û dewaran de be.

Hê dengê wî di guhê min de ye. Gelek caran dema ez û ew, em ji hev re dipeyîvin û em li nav beşçeyê wî digeriyan, tiliya xwe ber bi binê çinarê dikir û wiha digot: "Jîr lawo! Mala min a dawîn ev der e. Ger ku ez bimirim wê min li vir bi cih bikin. Dema min ev çinar çand ramana min ev bû." Êdî divê ku, em pêgavekê biavêjin. Apê xwe yî delal bînin binê çinara wî û bi laîqî bi cih bikin. Her wiha wesiyeta wî bi cih bînin.

Banga min pêşî ji mamosteyê min Yaşar kaya re ye. Daxwaza min ew e ku, ew serkêşîtiyê bike û ji bo vê yekê kampanyayekê veke.

Jîr Dilovan

Dijminên mezin

Di hejmara Welat a 79'an de, di rûpela 10'an, gotara quncikê "Pênûs" de mamoste Amed Tigrîs bi sernavê "Dijminên mezin û yê herî mezin" li ser dijminatîyê nivîsandibû. Di nivîsa xwe de gotibû ku, "Dijminên mezin Hikmet, Mehmet Moğoltay, Cevherî û ceşşên wek wan in". Na qurban, na! Ez dibêjim ku, ev kes nakevin qategoriya dijminan. Lewre dijminatî du tiştên li dijî hevdu ne ku li hember hevdu şer kirina wan e. Di misilmantîyê de hedîsek Pêxember heye, dibêje: "Men nekere eslehû nekere dîne hû" angu

dibêje "Kesê eslê xwe inkâr (red) bike, wê dîne (olê) xwe jî red bike" Eh ji van Hikmet Çetîn, hey cila bînamûsiyê avêtîye ser çavê (serê) xwe. Necmettîn Cevherî lê tu? Qaşo tu misilman î, qaşo tu şêx î? Tu bi qurbana ecdadê xwe bî. Ma mirovên te, %90'ê wan bi Tirkî nizanin, çawa tu li kok qelîhandina wan digerî? Ma tu dê koka kê, biqelîhîni?

Divê ku mirov navekî li wan ceşşên me bike, xayîn, noker, munafiq, murted, pîncik, togê kuçan û hwd.

Mehmet Aydın

Ferhengok

Çort: Çols (Patavatsız)
Ferş: Teht, kevirê pehn
Fort: Zirt (Palavra)
Palûte: Zibare (İmce)
Şemûs: Cirnexweş bîar (Huysuz)
Şêl: Liv, tevger
Vemilandin: Lêpêçan, hildana devzendikê mil û lîngan
Xwînmêt: (Vampir)
Zêrû: Zîlo, rawîra ku li xwîne dimije (Sülük)

Nûçeyên Cengê

Navenda Nûçeyan- 10 Îlon 1993: Hêzên dewletê avêtin ser gundê Heşterê ku li ser Farqînê ye û yê Dûderya ku li ser Pasûrê ye; tahde li gundiyan kirin û ew bi kuştinê tehdît kirin.

11 Îlon 1993: Kontrgerîla erebeya rêwiyên di çûn gundê Hatunlu (Amed) sekinandin, li wan gulle reşandin. 2 gundî bi vî awayî hatin kuştin.

li Elbîstanê du kes bi mebesta xayîntiyê; Şükür Soysüren û Hüseyîn Polat ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve bi mirinê hatin cezakirin.

Li ser îxbara ku li Cizîrê di malekê de gerîla hatine hewandin, hêzên dewletê girtin ser wê malê, gerîla û hêzên dewletê li hev xistin; 2 gerîla mirin, 2 tîmên taybetî jî hatin kuştin. Di vî navê de 2 zarok jî hatin kuştin. Li navçeyê derketina der hate qedexekirin.

Li Şaxê (Çatak) navçeya Wanê gerîla cerdî ser gundê Ferxînisê kirin, 4 cerdevan kuştin.

Dewletê li Agirî û Tendûrekê dest bi operasyoneke dorfireh kir, çûn û hatina gundan hate qedexekirin û hemû dever tîn bombekirin.

Ji Patnosa Agiriyê 6 cerdevan îstîfa kirin. Li Batmanê 4 dibistan ji aliyê ERNK'ê ve hatin şewitandin.

12 Îlon 1993: Di operasyona Agirî û Tendûrekê de dewlet devî û daristana dişewitîne. Li gor nûçeyên herêmî di vî operasyonê de heta niha 30 leşker hatine kuştin û zêdeyî 50 heban jî birîndar bûne.

Li Îdirê, li navçeya "Aralikê" tîm û leşker bi hev re avêtin ser

gundê 'Aşağıcamurlu' û li gundiyan îşkence kirin.

Hêzên dewletê li Licê avêtin ser gundê Sîsê, tevî mizgefta gund 12 mal şewitandin.

13 Îlon 1993: Leşkeran li Şimexê girtin ser gundê Avgamasya û Şilerût, 5 gundî kuştin.

Li Mazrayê (Elezîzê) di vegera operasyonekê de 13 leşker di kemîna gerîla de hatin kuştin. Li Gihadînê jî 8 leşker û 4 cerdevan di kemîna gerîla de hatin kuştin. Li Mêzgirta Dêrsimê, di şerê gerîla û hêzên dewletê de 4 tîm û 3 gerîla hatin kuştin.

Li Berwariya Sêrtê gerîla êrişî mewziyên cerdevan û leşkeran kir, 4 cerdevan birîndar kirin û çek û bêtêlên leşkeran bi xwe re birin.

14 Îlon 1993: Di operasyona dewletê ku li hêla çiyayê Tendûrekê ve pêk tîne de, gerîla helikopterekê anî xwar.

Hêzên dewletê Gundên Kohax, Atici, Gomik û Mexsozilo ku li ser Aralika Îdirê ne, şewitandin.

Li navbera Bogîlan (Solhan) û Pasûrê li herêma Serêspî gerîla û hêzên dewletê li hev xistin; 4 leşker û 2 gerîla hatin kuştin. Wekî din hêzên dewletê jî gundê Kuyê ku li ser Pasûrê ye 50 mal şewitandin û gundiyeke kuştin. Gerîla 9 cerdevan revandin. Ev cerdevan jî gundên Bêgove û Gerdiherkî ku li ser navçeya Navşana (Şemînanana) Cûlemêrgê ye ne.

Gerîlayên ARGK'ê li ser riya Ruhayê otobosekê şewitandin. Li Elaşgîra Agiriyê, di şerê gerîla û hêzên dewletê de 3 leşker û gerîlayek hatin kuştin.

15 Îlon 1993: Li Wanê li gundê Ezdînan ku li ser navçeya Şaxê (Çatak) ye gerîla û hêzên dewletê li hev xistin; serbazek, çawîşek û 10 leşker hatin kuştin. Piştî vî bûyerê li herêmê, dewletê dest bi operasyoneke dorfireh kir.

Gerîlayên ARGK'ê avêtin ser Qereqola "Yarımca" ku li ser Hewêlê (Bayqanê) ye, 9 leşker hatin kuştin û qereqol îmhâ bû. Li Şimexê jî gerîla avêt ser Tabûra İklîzce, 11 leşker hatin kuştin. Dîsa li Dêrsimê jî gerîla bi roketavêjan êriş bir ser Qereqola Xormekê ku li ser navçeya Nazimiye ye; 12 leşker hatin kuştin û qereqol îmhâ bû.

Li Agirî li gundên Dûtaxê, Xalik, Zorava, Şikefta û Nêriya ku li ser navçeya Gihadînê ne gerîla û hêzên dewletê li hev xistin, 4 tîmên taybetî û 30 leşker hatin kuştin. Gundî koçî navenda Gihadînê dibin. Li ser riya Cizîrê û Şimexê panzerê di kemîna gerîla de îmhâ bû.

Gundên li ser Mûşê hatin bombe kirin, 2 şivan mirin. Tîmên taybetî tevî panzeran bêsedem Gihadînê dan ber gulleyan; 2 gundî hatin kuştin.

16 Îlon 1993: Li gundên Çobanakeska û Gulikzer di nav hêzên dewletê û gerîla de şerêkî dijwar derket, li gor nûçeyên herêmî 33 leşker, 6 tîmên taybetî û 2 gerîla hatine kuştin. Li gor nûçeyên KURD-HA'yê tê gotin ku, li vî herêmê çekên kîmyewî tîn bikaranîn.

Li Erzînganê û Çepekcûrê (Bîngolê) gerîla 4 kes ji ber ajantiya wan, kuştin. Gerîlayên ARGK'ê jî Çermûka Amedê 13, ji Çîngûşê jî 19 lêzimên cerdevanan revandin.

Êrişên hêzên Sedam

Welat/Hewlêr- Hêzên Sedam êrişî ser navçeyêke Silêmaniye kirin û welatparêzekî Kurd qetil kirin. Li gor rojnameya Kurdistanî Niwê ku li Hewlêr derdikeve, di rojên 4 û 7'ê vî mehê de hêzên rejîma Iraqê bi hevkarîya Kurdên cahş êriş birin ser navçeya Şiwan a Silêmaniye û welatparêzekî xelkê gundê Tereqa, ku navê wî Cibrahil Mihemed e, kuştin. Li ser vî êrişê, pêşmergeyên Kurdistanî Başûr jî bersiva êrişkeran dan û du cahş kuştin. Piştî şikandina êrişê ji aliyê pêşmergeyan ve, hêzên rejîma Sedam de vera ku lê bûyer qewimîbû dan ber gulleyên top û çekên giran.

Dewletê girte ser taxa Cûdî

Navenda Nûçeyan- Hêzên dewletê li Cizîrê Taxa Cûdiyê bi ser malekî ve girtin, di navbera wan û gerîlayên ARGK'ê de pozberî derket. Di pozberiyê de 2 gerîla hatin kuştin. Li gorî agahiyên herêmî 2 tîmên taybetî, li gorî lagahiyên fermî jî polîsek hatiye kuştin.

Roja 11 ê Îlonê li Taxa Cûdiyê saet li 5'ê sibehê hêzên dewletê êriş birin ser malekî, der û dorên malê girtin û bi çekan kutan. Di navbera hêzên dewletê û gerîlayên ARGK'ê de pozberî derket. Di pozberiyê de 2 gerîla hatin kuştin, li gorî agahiyên herêmî 2 tîmên taybetî, li gorî agahiyên fermî polîsek hatiye kuştin. Piştî pozberiyê hêzên dewletê di operasyonê panzeran de beyan kirin û derketina kolanan dane qedexekirin. Gelê navçeyê bi kuştinê dane tirsandin. Li ser vî bûyerê esnafên navçeyê kepengên xwe dadan û çûne malên xwe. Piştî qedexekirina

derketina kolanan, hêzên dewletê navçe dane ber gulbaranê û rasteçepo li her derî gulle reşandin. Li Taxa Sûr du zarok hatin kuştin, Bedri Sağran, İbrahim Balçık û hinek kesên din hatin birîndarkirin, birîndar li Nexweşxaneyê Dewletê ya Cizîrê tîne tedawîkirin. Li gorî agahiyên herêmî, gulebarana hêzên dewletê bi giştî li ser taxên Cizîrê Kurtuluş, Dağkapi, Sûr û Konakê çêbûne. Li van taxan bi saetan dengê çekan hatiye û her celeb çek hatine xebitandin. Ji ber gullebarana hêzên dewletê 2 kamyonên Abdulkadir Satici hatine şewitandin, gulleyek roketavêjê îsabetî Ota Kadioğlu'yê kiriye û gelek xesar gihandiyê. Li ser bûyerên navçeyê, Serokê Belediya Cizîrê Haşim Haşimî got: "Dewlet çend roj bû li der û dorên navçeyê civînen mezin çêdikir, armanca wê xerakirina navçeyê ye ku, Cizîrê jî wek Şimexê bîne rayê".

HAWAR

Dilbixwîn

Yekîtiya Êzîdiyan

Ji bo vî koşeyê min nivîseke din amade kiribû. Di hejmara bê de eger tu rewş û problemên awarte dernekevin hûnê bixwînin. Di vî hejmarê de bi taybetî ez dixwazim dîsan li ser rewşa Kurdên me yê êzîdî rawestim.

Roja duşemê (13.09.93) bi şev ez û çend hevalan em bi hev re çûne Komeleya Celleyê. Weke tê zanîn Kurdên me yê Celleyê jî sedî 99 (%99) êzîdî ne ku, berî vî hejmarê min nivîsek di vî koşeyê de li ser wan nivîsibû.

Min ji welatparêzekî pirs kir:

- Gelo, hejmara Welat a vî hefteyê nehatiye?

- Hatibe jî ez êdî nema dixwînim.

- Çima?

- Qet...

- Bi qetê tu ji min xelas nabî. Bibêje sedem çî ye?

-Nivîsa te ya li ser êzîdiyan em xeyidandin. Te di vî nivîsa xwe de êzîdiyan baş û yê nebaş weke hev nixandibûn. Divê ji hev bihatana cudakirin. Keda me di nava şoreşê de gelek e, girîng e mîrov ji bîr neke (!)

Li ser êzîdiyan pêwîst e ji gotaran bêhtir pirtûk werin nivîsandin. Rastiyeke dîrokî heye; êzîdî neviyên Hezretî Zerdeşt in, zarokên agirî ne. Zerdeşt jî pêxemberê Kurdan e, di dema împaratoriya Medya de Zendavesta wî pirtûka

Tu kes nikare înkare bike ku, di nava şehîdên serxwebûnê de bi dehan Kurdên êzîdî hene ku, heya dawiyê li ber xwe dane û xwesparî nepejirandine. Kesekî ku qebûl neke, gora şehîd Bêrivanê ji her kesî re bûye serdangeh tune ye. Ji bo vî yekê û ji ber ku êzîdiyan li hember êrişan heya dawiyê ola xwe, ziman, kesayetî, dîrok û lawjeyên xwe parastine, mirov neçar dimîne ku bi rêzdarî li hember bisekine.

fermî bûye. Piştî doliwgeriya Ereban û pejirandirra ola îslamê, weke oleke fermî (resmî) Zerdeştî û felsefeya wî bi yek carî tîne qedexekirin. Kesên ola îslamê û îdeolojiya feodalizma Ereban nepejirandine, ji bajarvanî û pêşveçûna civakî dîr ketine. Jiyan li wan qedexe bûye, mafê zanîne ji wan re tune bûye û bi serbestî xizmet ji ola xwe re nekirine. Lê belê cihê şanaziyê ye ku, di bin hîkarî û bandora biyaniyan de nemanê û

asîmile nebûne. Ji ber ku her tişt ji wan re qedexe bûye, bi dorfirehî nivîs û lêkolînên li ser wan nayên peydakirin. Qewl û lawjeyên wan tenê yê jiberkirî mane, nehatine nivîsandin.

Ji komeleyê em çûne maleke din, li wir min şexekî êzîdiyan dît (Şêx Hisên). Careke din em li ser vî mijarê axivîn, wiha got: "Baş bû min tu dîtî. Di civîna Yekîtiya Êzîdiyan de jî, em çend heval li ser nivîsa te sekinîn. Em rexne dikin. Ji ber ku tu caran me negotiye welatê me Êzîdîstan e. Em xwe Kurd û welatê xwe Kurdistan dibînin, ev berî her tiştî ye, lê em ji hêla olî ve êzîdî ne."

Der barê vî de ez dixwazim vî bibêjim: Tu kes nikare înkare bike ku, di nava şehîdên serxwebûnê de bi dehan Kurdên êzîdî hene ku, heya dawiyê li ber xwe dane û xwesparî nepejirandine. Kesekî ku qebûl neke, gora şehîd Bêrivanê ji her kesî re bûye serdangeh tune ye. Ji bo vî yekê û ji ber ku êzîdiyan li hember êrişan heya dawiyê ola xwe, ziman, kesayetî, dîrok û lawjeyên xwe parastine, mirov neçar dimîne ku bi rêzdarî li hember bisekine.

Li vî tiştêkî din heye. Ji êzîdiyan gelek kes haya wan jê tune ye. Divê, vî olê û felsefeya fireh biparêzin û nehêlin ku kesek pê bileyze û tîxe bin xizmeta berjewendiyên xwe û malbata xwe. Min di nivîsa berê de jî gotibû, dîsa jî dibêjim: Girîng e em hişyar bin, rê nedin tu kesekî ku ola me, kultur, lîteratur, erf û adetên me erzan bike û bifiroşe. Bêguman ger dijmin valahî û delîveyê (fersendê) bibîne, dê tavilê dest bide ser û ji xwe re bi kar bîne.

Ez di nav êzîdiyan de me. Bi xweparastina wan a ji asîmilasyonê pîrr serbilind im. Ger di pêvajoyên herî dijwar û zor de, di nava qirkirinan de xwe parastibin, di vî firehî û hebûnê de wezîfe û delameta herî pêwîst ew e ku, xwe biparêzin. Ev peywira me hemûyan e.

Karê Arafat û Rabîn zor e

Nuçeyin Derve- Plana Gaze û Erîxayê li paytexta DYA'yê, li Washingtonê roja 13'ê Îlonê, bi destê Wezîrê Karên Derve yê Îsraîl Şimon Peres û Berpirsiyarê Têkiliyên bi Ereban re û Têkiliyên Navneteweyî yê RRF'ê Ebû Mîzan, bi beşdarbûna Serokwezîrê Îsraîl Îzaq Rabîn, Serokê RRF'ê Yaser Arafat, Serokê DYA'yê Bill Clinton û sê hezar kesên din hate îmzekirin. Civîna peyman îmzekirinê bi axaftina Bill Clinton dest pê kir. Piştî îmzekirinê li ser navê Rexistina Rizgariya Filistinê Yaser Arafat û Ebû Mîzan, li ser navê dewleta Îsraîl jî Şimon Peres û Îzaq Rabîn axaftinek kirin.


Ev plan, piştî nakokiya sалан ji aliyê hinek kesan ve, nemaze jî, ji aliyê berdevkên Sazûmana (Nizama) Nû ya Dinayê ve wek gaveke dîrokî tê nirxandin. Ji lew re, derî ji gelek hêviyan vedike. Her wiha ji ber ku naveroka vê planê ne zelal e û daxwaza gelê Filistinê ji bo mafê çarnûsê nayne cih, gelek şik û gumanan jî bi xwe re tine.

Li gor vê planê divê leşkerên Îsraîlê di nava 6 mehan de ji Gaze û Erîxayê derbikevin û piştî wê di nava 4 mehan de jî divê li wan deveran hîlbijartin çêbibe û hemî West Bank tekeve bin bandora Filistinîyan. Di nava vê peyman xweseriyê (otonomî) de li ser ewlekariya heremê, li ser avakirina sistemeke



Yaser Arafat

Plana Gaze û Erîxayê li paytexta DYA'yê, li Washingtonê roja 13'ê Îlonê, bi destê Wezîrê Karên Derve yê Îsraîl Şimon Peres û Berpirsiyarê Têkiliyên bi Ereban re û Têkiliyên Navneteweyî yê RRF'ê Ebû Mîzan, bi beşdarbûna Serokwezîrê Îsraîl Îzaq Rabîn, Serokê RRF'ê Yaser Arafat, Serokê DYA'yê Bill Clinton û sê hezar kesên din hate îmzekirin.



İzak Rabîn

aboriyê û alikariya navneteweyî hinek tiştên gotin. Ji ber gelek tiştên nezelal hene û tiştê ku Îsraîl jî vê peymaê dipê, tiştên RRF jî dipê ji hev cuda ne, dê gelek nakokî derkevin pêşberî Rabîn û Arafat. Dewleta Îsraîl vê plana weke çareserkirina pirsgerêka Filistinê nişan dide û naxwaze li ser probleman raweste, lê RRF vê peymanê wek gava yekemîn dinirxîne.

BERPEYIYÊN LI HEMBER XWESERIYÊ.

Plana xweseriyê, ji herdu aliyên ve jî berpeyiyên (reaksiyon) tûj distîne. Cihuyên nijadperest, vê planê wek gavek bipaşve avêtinê dibînin û li dijî vê planê radibin, xwepeşandanan li dar dixin û vê planê protesto dikin.

(Divê bê gotin ku, mirovên aştiwaz ên Îsraîlê jî bi pîrozbahiyên piştigiriya aştiyê dikin.) Yek ji wan mirovên nijadperestan ji ajansa Reutersê re wiha digot: "Rast e dibe ku Arafat bi zindî were vir ji bo otomiyê ava bike, lê ez bawer nakim ku bi wî awayî ji dest me xelas bibe."

Li aliyê din hêzên Filistinî yên rizgazîwaz, xweseriyê napejirînin. Ji ber ku, ev tişt daxwaza wan ji bo çarenûsê nayne cih. Li nikê yekê gelek nezelalî di nava vê peymanê de hene.

Mînak RRF jî bo çareserkirina pirs-girêkên gel û Rêxistinê yên aborî alikariyên ku dê piştî Xweseriyê ji derve bînin wek derfetekê nişan dide, ji wî aliyê ve zêde tiştên bi dest bike-

vin naxuyin, dewletên Erebiyê piştî Şerê Kendavê alikariya xwe birin, dewletên Rojava jî dil nakin zêde gavan biavêjin. Piçek bêhn li ber wan fere bibe jî, ji wî aliyê ve Îsraîl zêdetir tiştan bi dest dixê, ji bo dê ambar-goyên Ereban yên li ser Îsraîlê rabin. Di nava peymanê de tê gotin ku, ewlekariya û Herêma Xweser dê bi destê polîsên Filistinî çêbibe, lê ewlekariya taxên Cihuyan bi destê leşkerên Îsraîl çêbibe û bandora wan li ser Filistinîyan ne kifş e. Ev xweserî, birînen gel derman nake, jixwe ev herêm di nava Filistinê de deverên herî xizan û serhildêr in û gelek kesên nefkirî jî derî van herêman in. Ji lew re gel jî bi vê yekê zehf kêfxweş nebû.

Gelek rêxistinên di nava RRF'ê de, wek Eniya Gelî Ji bo Rizgariya Filistinê Femandariya Giştî, Eniya Rizgarî ya Gelê Filistinê, rêxistinên ji derî RRF'ê, wek Hammas li hemberî vê peymanê radibin. Serokê Eniya Rizgarî ya Gelê Filistinê George Habaş daxuyand ku, divê ew eniyekê nû ava bikin. Hammasê jî daxuyan ku, ew dê şerê birakujiyê nekin. Serokê Eniya Gelî Ji bo Rizgariya Filistinê Femandariya Giştî Ahmed Cîbrîl li ser pîrsekê, kuştina Yaser Arafat anî ziman û wiha got:

"Na, wî kesî ez nakujim, lê gel kesê ku ji sedî not erdê Filistinê jî Îsraîl re bihêle efû nake û di mitbexa her Filistinî de kêrek tê dîtin." Çavkaniyên nêzik Filistinîyan dibêjin Îsraîl bi vê peymanê hem dubendî xist nava Ereban, hem jî xist nava hêzên Filistinî. Heke bi Îsraîl re tev bigihîştina encamekê diviyabû ku, zêdetir tişt bi dest bixistana.

Weke tê zanîn Ûrdîn, Sûriye jî bi Îsraîl re di guftûgoyê de ne û nemaze Sûriye bi vê lihevkirinê dilxweş nebû.

Ya ku herî zêde bi vê peymanê kêfxweş bû DYA û Serokê wê Bill Clinton e. Ew vê lihevkirinê wek serketina Sazûmana Nû û xwe dibîne. Ji lew re CIA û MOSSAD jî bo parêzkariya Arafat zend û bend vemilandin, ji ber ku naxwezî ev serketin bi avê ve biçê.

Li Polonyayê hêzên çepgir xurt dibin


Nuçeyin Derve- Li Polonyayê roja 19'ê Îlonê dê hîlbijartin çêbibe. Li gorî agahiyên hinek çavkaniyan, ihtimala (dibetî) bi serketina komunistên kevin pîr zêde ye.

Li Polonyayê piştî hilweşîna sosyalîzma reel, Serokê Sendikaya Piştigiriyê Lech Walesa, hate ser kar. Her çîqas Walesa li ser navê demokrasiyê hatibe jî wek hevalên wî dibêjin: "Tiştê ew jî demokrasiyê fêhm dike, ji tiştên ku, Napolyon jê fêhm dike ne zêdetir e."

Piştî demekê hemû hevalên wî ew terk kirin û wî niha jî bi navê "Ji bo Piştigiriya Reforman Tevgera Nêpartî" ku, bi Polînî kurtenivîsa wê "BBWR" yê, avakiriyê û dixwaze bi dek û dubaran (dolaban) serkariyê heta dawiyê bidomîne.

Li Polonyayê hêzên rastgir ji hev ketine û ji ber ku, di hîlbijartinê de pêşbirî (baraj) heye- partiyek jî bo ku tê keve Sejmê, angoye parlamentoya biçûk, divê ji sedî 5 raya gel bistîne- nikarin bikevin parlamentoyê. Tenê Tevgera Demokratîk, a serokwezîrê kevin û bi ihtimaleke biçûk jî BBWR'ya Walesa dikare tekevê parlamentoyê. Walesa Ji bo ku, keys nekeve destê komunistên kevin hewl dide ku, hêzên rastgir bigihîne hev.

Li aliyê din hêzên çepgir di bin navê Hevkariya Çepgir a Demokratîk de, hevkarîyek çêkirine. Li gor çavkaniyên objektîf dê ew tevger ji sedî 20 raya gel bistîne. Gel



Gelê Polonyayê ji bo azadiyê dengê xwe bilind kir, lê kapitalizmê ew bêkar û bê mecal hiştiye.

ji ber kapîtalîzma ku, bi timtêlên demokrasiyê hat, ji bilî xizaniyê û bêkariyê tiştêk bi xwe re neanî, dengê xwe dide hêzên çepgir. Di vê yekê de hinek nexşên nostaljik jî hene. Niha li Polonyayê hejmara bêkariyê jî sedî panzdeh e.

Her çîqas hêzên çepgir dixwazin guharinên di fikrên xwe de nîşanî Walesa û hêzên împeryalistê bidin jî û soza domkirina reforman û parastina seretayên "bazara serbest" didin jî, ew qîma xwe pê nayînin.

Badanewey Azerbêcan berew Rûsiya

Nuçeyin Derve- Herçende le sayeyê koşîşî diplomasiyê Îran ewe rêkkewtinêkiyê katekî bo westandinî kûştî nêwan hêziyê Ermenî û Azerî hatote kayewe, belam hêştan peşewîyê û natebayî hereşe le hemû koşîş û rêkkewtinêk dekat.

Wezîriyê Dereweyê Îran Elî Ekber Wîlayetî pêwendiyê be Wezîriyê Dereweyê Ermenîyan kirduwe û tîyê geyenduwe ke pêwîste hêzekaniyê Ermenî le xakiyê Azerbêcanê bikêşenewa û wîtuwêjîyê siyasî bo çareseriyê tengîyê Qerebaxê bikrê. Her wiha Wîlayetî hereşeyê le Ermenîyan kirduwe ke îtirê hêrişê nebate ser Azerbêcanê û gutîyeyîyê ke berdewambûnîyê em hêrişane metirsiyê şerêkiyê deverayeyîyê gewreyê lê dekwetewe.

Heyder Eliyêv le rojîyê pêncemîyê em mange da le kobûneweyekê legel balyozîyê Îran le Bakû daway le hikûmetîyê Îranê kird ke hawkariyê Azerbêcanê bikat û palepesto bixate ser Ermenîyan bo ewey îtirê dest le hêrişîyê serbazî bo ser Ermenîyan helgirê. Le layekîyê tirewe Eliyêv le Moskowê dimaneyî Serokê Borîs Yeltsînî, serokîyê Rûsiyayê kird. Dengûbasiyê em dimaneyî weha geştiye Tehranê ke Eliyêv daway le Moskowê kirduwe bo ewey hêzî serbazî binêrête nawçeyê ser sinûriyê Azerbêcanê legel Îranê û Ermenîyan da. Eliyêv gutiyê Keweyê deweyê çewtiyekaniyê serokayeyîyê pêşîyê Azerbêcanê le beramber Rûsiya da rast bikatuwe. Her weha serçaweyê

kan gutiyê Eliyêv daway eweyîyê Kirdaweyê ke wilatekeyê biçete naw rîziyê "wilataniyê serbexowe". Îtirê bem şeweyê deselatîyê Rûsiya le Azerbêcanê da peredestênê û Îranîş bem gorankariyê tengetawê debêt. Belam le hermanê kat da Îranê heq be Eliyêvê dedat lebareyê em heluwêsteyeweyê eger bêwê lem layeşeweyê têkelawîyê xoy legel Îranê da pere pê bidat. Emeş Bako ziyatir le çetîrîyê Turkiya Dûrê dexatewe.

Herweha Heyder Eliyêv dî rojê berleweyê serdaniyê Moskowê bikat yekê le kone Karbedestaniyê Sovyetîyê Konîyê Kird be balyozîyê wilatekeyê le neteweyê yekgirtuwekan da ke ewîşê Hesên Hesênovê. Emeş belgeyê goranêke le siyasîyê dereweyê Azerbêcanê da. Eliyêv gutiyê Keweyê diplomasiyeyîyê Azerbêcanê îtirê koşîşê dekat bo pere pêdaniyê pêwendiyê deverayeyîyê xoy, ew şîyê Îranê be tengetawîyeweyê çawerêyê dekat. Îranê çawenor bû hendê rêkkewtinîyê girîngê le bareyê newteweyê legel Azerbêcanê mor bikat, belam êsta Azerbêcanê delê ke em rêkkewtinane legel hendê layenîyê serbexowê da çêbecê dekat. Aya nizîk bûneweyê Azerbêcanê le Rûsiya ke be dirêjayî maweyê pêşîyê piştîyê Ermenekaniyê degirt le şerîyan dijîyê Azerbêcanê da watayê ewe degeynê ke îtirê le Îranê bedûrê debêt?


Welamiyê em pîrsiyare le 3 iyê mangîyê dahatû da dête dest ke jwanîyê helbijardîniyê seroke le Azerbêcanê da.

Tûrîst hatin berdan

Navenda Nûçeyan-Tûrîstên ku di navbera mêtûyên 13 û 19'ê Tebaxa 1993'yan de ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hatibûn revandin, hatin berdan. Ji tûrîstan Anna û Nîco Piant Swîsreyî, Angelo Palego û Giuseppe Reznicko Îtalyanî, Henry Butler û Cristoph Lehman Almanî û yê ji Zelenda Nû Paul Tompsondi 15'ê Îlonê de li nêzîkî gundê Tavla ku li ser navçeya Bazîdê ya Agiriyê hatin berdan.

Piştî tûrîst hatin berdan, vê carê ji aliyê Dozgeriya Bazîdê ve bi mebesta ku alîkariyê bi PKK'ê re dikin hatin girtin û rojekê ji bo îfadeyên wan bèn girtin, girtî man. Waliyê Agirî di daxuyaniya xwe ya çape-meniyê de diyar dikir ku, ev tûrîst ne ji bo gerê hatine, têkiliyên wan bi PKK'ê re hene, piştgirî didine wan û dixwazin li van deran wan bikişînin vîdeo û kamereyê.

Heyeta ku ji bo tûrîst



Di wêne de tûrîstên ku demeke berê bi gerîla re jiyayî, memnûn xuya dikin.

bên berdan û ji 21 kesan çavdêriyên xwe wiha anî zimên: "Tiştê pêşî li vir bala me kirand, operasyona leşkerî bû. Misêwa li dor me po-

Fransa bala tûrîstan kişand Kurdistanê

Wezareta Karên Dervehî yê Fransa yê bala tûrîstên Frensî kişand ser talûkeya li Kurdistanê, ku dema herin Tirkîyê bi wê herêmê ve neçin an jî heke herin jî divê baş hayî ji xwe hebin.

Wekî din piştî vê îxtara wezareta Karên Dervehî yê Fransayê, li ser navê Sendîqaya Rê û Transportasyona Neteweyî ya Fransayê Sekreter Ph. Vidal jî bala tûrîstan kişand ser vê daxuyaniya Wezaretê û xwest ku li gor van mercan programên xwe amade bikin.

lîsên sivil, bêtêl di dest wan de digeriyan. Piştî ku ERNk'ê got emê 7 tûrîstan jî berdin berdan lê Dozgeriya Agiriyê ew girtin. Ev skandal e." Wekî din mebûs Ingaro:

"Ev cara yekemîn e ez tîm virê. Li virê xeynî pîrs-girêka Kurdî, Pîrs-girêka demokraseqiyê jî heye. Em li virê leqayî îhlalkirina mafên mirovan bûn. Divê Îtalya têkiliyên navbera xwe û Tirkîyeyê ji nû ve ji ber çav derbas bike. Em herin neçin emê hikûmeta Îtalyayê bi vê rewşê agah-

dar bikin ku nebe şîrikê van bêmafîyan." got.

Piştî li Dozgeriya Bazîdê îfadeyên tûrîstan hatin standin, ew hatin berdan. Li aliyê din di 11'ê Îlonê de gerîlayên ARGK'ê di nav rîya Mûş û Çepekcûrê (Bîngol) de 5 tûrîstên din hatin revandin. Ji van tûrîstan 3 heb Bangladeşî, 2 jî Îranî ne. Çavkaniyên gerîla dadixuyînin ku, siheta tûrîstan baş e, lê ji ber ku bêdestûr hatine Kurdistanê û dibin alîkar ji aboriya Komara Tirkîyê re, hatine revandin.

Karayalçin bi ser ket

SHP'ê qalik guhert

Navenda Nûçeyan-Kongreya SHP'ê ya 4'emîn bi serfiraziya Murat Karayalçin qediya. Serokê Giştî yê kevin Erdal İnönü, de wek mebûsekî normal xebatên xwe bidomîne. Bi beyanên Karayalçin kifş bû ku, koalîsyona SHP'ê û DYP'ê jî berdeyam e. Di nav berendamên serokatiya SHP'ê de, ji DYP'ê re yê herî nêzîk Murat Karayalçin bû. Di nav dîtînen Murat Karayalçin û Tansu Çiller de, çî di warê aborî û çî jî di yê demokratîyê de cihêrengiyên girîng nîn in. Murat Karayalçin, di nav SHP'ê de jî bi dîtînen xwe yê rastgir tî nasîn. Ev yek, di kongreyê de xwê di axaftinên muxalîfên Karayalçin de jî diyar kirin. Berendamên din Aydın Güven Gürkan û Yüksel Çakmur, bi giştî li ser vê mijarê êrîşî Karayalçin kirin, lê bi ser neketin.

Murat Karayalçin bi dîtînen xwe yê der barê pîrs-girêka Kurdî de jî, zêdetir nêzîkî partiyên rastgir e. Bi beyanên xwe yê li ser vê mijarê diyar kir ku, piştgirê qetlîamên ku li Kurdistanê tîne meşandinê ye. Piştî kongreyê jî dijberiyên di nav Aydın Güven Gürkan û Murat Karayalçin de çareser nebûn. Gürkan berendamîya xwe ji bo serokatiya Gruba SHP'ê ya li meclîsê danî. Karayalçin, pêşî li hember vê yekê derket û daxuyand ku, di nav SHP'ê de destûrê nade dusefîbûnê, lê dû re li ber xurtbûna hêza Gürkan bi paş ve gav avêt û vê berendamîyê qebûl kir. Bi ihtimaleke mezin, dê Gürkan di meclîsê de bibe Serokê Gruba SHP'ê.

Li aliyê din wisa kifş bûye ku, de şerê qirêjî yê ku li Kurdistanê bi destê dewletê didome, bi pişt-giriya Karayalçin diwartir bibe. Weke ku beriya kongreyê di rojnameyan de jî hate nivîsîn, Karayalçin berendamê generalan bû û piştî ku hate hibbijartin, de deynê xwe bi zêdeyî li generalan vegîne.

Çiller li Almanyayê tî protestokirin

Navenda Nûçeyan-Komîteyên Kurdistanî li Almanyayê ji bo protestokirina Tansu Çiller bang li raya giştî ya Almanyayê û gelê Kurd kirin.

Komîteyên Kurdistanî, li ser protestokirina geşta Tansu Çiller ku, de di navbera rojên 2022'yê Îlonê de çêbibe, daxuyaniyek weşandin. Di vê daxuyaniyê de bala raya giştî û hemû kesên mirovhez û pêşverû kişandin ser terora ku li Kurdistanê tî meşandin û pest û pêkutiyên li ser gelê Kurd. Daxuyaniya Komîteyên Kurdistanî wiha didome: "Tansu Çiller rêvebira şerê qirêjî ye. Hê çend roj berê mebûsek jî di nav de 6 endamên DEP'ê hatin kuştin. Zilm û zordariya li ser rojnamegerên Kurd jî berdeyam e. Ji 15'ê Hezîranê vir ve 9 nûçevanên Özgür Gündem'ê hatine kuştin. Êdî komara Tirk çekên kîmyewî jî bi kar tîne. Li çiyayê Nûrheqê 19 gerîla bi vî awayî hatin kuştin.

Ev tişt hemû di bin çavdêriya Çiller de çê dibin. Lewre divê Almanyayê vê qebûl neke û mirovên aşîxwaz, demokrat hatina wê protesto bikin".



Çiller ji ber neheqîya ku li gel tî kirin, ji aliyê şoreşgeran ve hate protestokirin.



Komîteyên Kurdistanî bang li gelê Kurd jî dikin ku, geşta Çiller bi meş û xwepêşandanên girseyî protesto bikin

Li ser vê banga Komîteyên Kurdistanî, li gelek bajarên Almanyayê, wek Koln, Düsseldorf, Stuttgart, Ulmê û li payîtexta Belçîka, Brukselê welatparêzên Kurd livbaziyan pêk anîn û gelek saziyên çap û weşanê dagir kirin.

Mirovên welatparêz, armanca livbaziyan xwe wiha diyar kirin: "Em dixwazin heya ku daxwazên me bêne qebûl kirin, em livbaziyan xwe bi aşî bimeşînin. Divê nûçeyên der heqê Kurdistanê de, bi awayekî objektîf bêne dayîn, li hember şerê ku li Kurdistanê didome, sersar nîn bin û hatina Çiller a Almanyayê û girtina Yaşar Kaya protesto bikin".

Li Sîlvriyê hevpeyvîn bi karkerên acûrê re

Kî dike, kî dixwe!..



Iro li Kurdistanê rewşeke kambax xwe dide nîşan, ji her aliyê ve êrîşên hovane li serê didomin. Ev rewş dibe sedema gelek bûyerên nerind, her wekî li her derê Kurdistanê ber bi Tirkiyeyê ve koç û ji welat dûrketinên mezin pêk tî. Ji aliyekî din ve jî xortên Kurdistanê ji bo kar û emel û ji bo jiyaneke rind berê xwe didin welatê xerîbiyê. Li Tirkiyeyê çî kar û emeli bibînin dikin.

Ji bo hevpeyvînekê em çûne navçeyeke Stenbolê Sîlvriyê. Ev der ji Stenbolê 30 km dûr e, kargeha ku zarok û xortên Kurd tê de dixebitîn, ji navçeya Sîlvriyê 23 km dûr bû. Navê vê kargehê "Kargeha Volkan a Acûrê (Volkan Tuğla Fabrikası)" bû. Bi giştî zorok û xortên Kurd tê de kar dikirin û giştî ji bajarekî Kurdistanê ji Wanê hatibûn. Lê bi hatina me re xebatkarê kargehê ketin xişûşiyê, bi tirs bi me re peyvî. Bawer nedikirin ku, em rojnamevan in. Ji me nasnameyên rojnamevaniyê xwestin. Di destê me de jî rojnameya Özgür Gündem û Welat dîtîn, paşê hinekî ber bi me ve hatin û germiyek kete navbera me. Tirs wan ew bû ku, bi hatina me re xwediyê kargehê wan ji kar biavêje. Her wekî digotin "Wê bibêjin hûn giş PKK'van in, hevpeyvînan ji rojnameyan re dikin" Piştî vê daxwaziya wan me jî nasnameyên xwe yê rojnamevaniyê nîşanî wan da.

Ew cihên ku zarokên Kurd tê de dixebitîn, bi rastî ne cihê kar û xebatê bû, rewşa wan xebatkarên di kambaxiyeke herî mezin de bû. Ev kes ji Kurdistanê hatibûn û bi hinek hêvî û baweriyên ji welatê xwe dûr ketibûn. Hemû bi hev re kar dikirin, lê di navbera wan de li gorî nêrîna

me tu hevaltiyeke girîng tune bû. Zarokên ku di kargeha acûrê de dixebitîn, di her karên kargehê de cih digirtin û hemû bargiranî li ser piştê wan zarokan bû. Dema mirov têkilî bi zarokan re çêdikir kardar (xwediyê kar) li hember me derdiket û nedihîşt ku, em der mafê zarok û

zarokan dikir. Li ber çavê me jî li zarokê da û pozê wî di xwîne de hişt.

Di hundirê kargehê de rewşa mirovên wir bi hêsanî dihat xuyan. Cihên raketinê, cihên ku mirov lê bisekine û tê de bi firehî rakeve nîn bû. Di gazînoya wan de televzyonek hebû û cihê

ne tu rewş e, ka em çawa bikin?" Dema me wêneyê xortekî kişand, wî digot: "Bisekinin ez herim çekên xwe yê nû li xwe bikim û paşê bikişînin." Em nêzikî xortekî din bûn, navê wî Sezaî bû. Me rewşa wî pirsî. Got: "Paşê." Lê bi dengê nerm, devê xwe anî ber guhê

bi topê dileyîzin û carinan bi dameyê." Di dilên wan de kesera welat xwe bi hêsanî dida der. Wek du sê mehan wê bixebitin, di dawiyê de wê herine Stenbolê li bajêr bigerin û ji xwe re kincên li gorî xwestina xwe bikirrin. Wê paşê berê xwe bidine welatê xwe. Lê ji bo vê rewşê jî pêwîst e pîrr qehir û cefa bikişîne, gelek rojên dijwar derbas bike.

Em bala xwe didinê ev zarokên hanê bi hinek hêviyên mezin tene van deran. Lê bi dilxerabiyeke mezin ve diçine welatê xwe. Li welatê xwe tu rehetiyekê nabînin, her dem rastî êrîşên dewletê yê hovane tî. Kedxwar ji wan re "terorîst, xînisê welat" û hwd. dibêje. Ew li welatê xwe tu tamedê jî jiyana xwe nabînin û berê xwe didine biyaniyê. Li van deran ew pîrr xerîb dikevin, diçine ku derê li wir rastî diwariyên kambax tî. Dixwazin hezkiriyeye wan hebe. Lê bi rastî ew jî pîrr dîrî wan e. Gazîno li hember wan e, kersaxa behrê û hemû bajar pêşberî wan e. Bi rik in, ne li welatê xwe, ne jî li dereke din cihên wan tun e, ew bi tenê ji bo xweşkirina jiyana hinekên din hatine dinyayê. Ew dê bikin û hinekên dinê bixwin.

Dem a jî kargehê dûr ketin rewşa wan zarok û xortan di dilê me de ma. Lê bi rastî bi dilgirîni em ji wan qetiyên. Ev zarok û xort di vê qirnê de, di vê rewşê de...Vê gavê em gişt wiha bêguman û bêçare li ber derê neyaran dil û bende ne. Lê baweriyaya me ew e ku, dê rojê welatê me jî hebe û emê jî bigihîjin mexsed û miradan.

**M. Zahir Kayan
Salih Günbat**



Karker li ber derê kargeha acûrê (tuxle)

xortan de agahiyan bistînin. Navê kardarê zarok û xortên kargehê Mehmed bû, wî digot: "Tu kêmasiyeke me tune, em gişt li vê derê wek bira dixebitin. Her kes li gorî xebata xwe pere distîne û meha zarokan tê sê milyonî zêdetir. Em li vê derê bi serê xwe ne, tu kes têkilî me nabe. A go yê ku li vir kar dikin gişt Kurd in û ji Wanê hatine."

Lê li gorî dîtina me rewş ne wek gotina kardar bû. Kardar bi xwe, kotekiyeke mezin li wan

çay vexwerin û nanxwerinê jî ne ewqas rind bû. Ew zarok û xortên li wir kar dikirin, wek stûxaran li çarmedorên gazînoyê(!) diçûn û dihatin. Dixwestin ku werin bi me re biaxifin, lê destûr nedihate dayîn. Ji Kurdistanê Başûr jî xortek li vir kar dikir. Navê wî Armanc bû. Armanc bi çekên xwe yê pîrrî pirtîbûyî ve pozek da makîneya me, di çavên wî de jî hêviyên giran hebûn. Di gazînoyê de em bi Elî re diaxifin, ew dibêje: "Rewşa me

me û got: "Ma di vî halî de ezê çawa baş bim." Piştî xebatkarên, me xwest ku em bi çawîşên wan re bipeyvî. Lê çawîş (kardar) qet nedixwest ku, bi me re bipeyive. Me xwest em navê wî hîn bibin. Navê wî Mahsûn bû. Xebatkarên kargehê jî navê Mahsûm pîrr hez dikirin lê ne ji wî. Em nêzikî hevlekî din bûn, navê wî Îlhan bû, me jê pirsî: "Hûn di demên xwe yê vala de çî dikin?" Bersiva wî: "Wele jixwe em diwestin lê dîsa jî em



Hemû tariya cîhanê nikare ron-
ahiya fenerekê biveşere.

Gotina pêşiyên İngilîzan

Şîrhelaltî pere nake

Ji henga ku biryara radana HEP'ê (Partiya Keda Gel) hatiye dayîn û bi ser de jî, ji mebûsiyê ketîna Serokê wê yê Kevin Fehmî Işıklar hinek kesên çavnebar pêşkarî Yekta Güngör Özden bûne. Destê xwe kirine tînika rebeno. Heyra ez nizamim jê çi dixwazin.

Lê ez dizanim çima bela xwe di Serokê Dadgeha Qanûnê Bingehîn Özden didin. En ku jê venagerîn û rexneyên ne di cih de û ku heq nekiriye lê digirin, olperest, lîberal û komarxwazên duymîn in. Komarxwazên duymîn ew in ku, rexne li komara kevin dikin. Dixwazin xwedêgiravî Tirkiye ji aliye demokrasîyê ve bi pêş ve here, qayde û qanûnê berê biguhêre, xwe nû bike, qayde û qanûnên demokratîk ên cîhana nû binin Tirkiyeyê.

Xwedawo tu me ji kesên bi dev rast û bi dil xinis bihêvişî (muhafîze bikî). Di dewlet û komara Ata û di bin serokkomariya Bavo de çi dibin? Bi Xwedê ev şanê dinya xerabûnê ne. Ji kesê dilsoz, şîrhelal, bi kêr, jêhatî û yên ku bi dil û can li Şoreşên Ata derdikevin, tu rûmet ji wan re nemaye. Bîlî çend kesan wek, İlhan Selçuk, Ahmet Tamer Kişlalî û Zülfü Livanelî...

Hûn binêrin ka nivîskarê me yê bi nav û deng ku, di rojnameya Cumhuriyet'ê de dinivîse çi dibêje: "Li Anadolîyê kesê ku bixwaze bi çêkirina Atatürk bibe çepxwaz wekî kesê ku dixwaze bi çêkirina Xwedê (dûrî) bibe mumîn e." Min çavê te xwaro. Kesên wekî te dikarin ji heqê wan bêîmanan derkevin. A wisa, ca hema car caran dirêja xwe di hinekan de rabike bila bisilikin, hêrs bin.

Serokê Meclîsa Tirk Husamettîn Cîndoruk jî, van rojan ji serê xwe derketiye, bûye zende Wele bavo, wî jî xwîna xwe kiriye kevçî.

Rabûye rexneyên neheq li Serokê Dadgeha Qanûnê Bingehîn Yekta Güngör Özden'ê me dike. Wî bi devjêbernedana ji peywira (wezîfeya) Serokatiya Dadgeha Qanûnê Bingehîn sîddar dike. Çima ku pênc general (îca pênc general, tu lê binêre) hatine ser hikûm; meclîsê, qanûnê bîngehîn û hemû sazî û sazgehên demokratîk ji navê rakirine, derî li wan radane, lê Özdenê me li ser peywîr û karê xwe maye. Çûye ew pîrozbahî kirine ji ber derbeyê. Ev qanûnê Bingehîn a 1982'yan jî berhemeke leşkerî ye û ne rewya ye (meşrû ye).

Lewma jî bûye piştvanê Fehmî Işıklar. Li dijî Özden rabûye ku çima mebûsiya wî betal kiriye. Ez ji te dipirsim ey birêz Cîndoruk, li wî Kurdê xinis xwedî derbiketa he? Kurd gişt tevlihevkar, veqetînxwaz, geremolxwaz û benikê dû hebanê ne. Hefsarê wan di destê xelkê de ye, aqilê wan ji kîsî xelkê de ye, car caran kesên mezin û aqilmend jî, ji nav wan derketine.

Ma hûn bûyera Mîrê Botan û kurê wî ya li ser kewê nizanin? Çi dibêje, "Kêsê ku neyarê qewmê xwe be divê serî bê jêkirin". Ez dîsa ji te dipirsim, hûn çawa dikarin ewletiya xwe bi kesên wisa bînin û piştvaniya wan dikî? Ew dê rojekê bibe edûyê serê me jî.

Ez ji wê tînegihim ka hûn çima li Özden'ê me yî reben û belengaz wisa bi gef û gurin, di her keysê de hûn tîştan dikin qar û li rûyê wî dixin. Min nedixwest bibêjim lê, hûn nanê ser çokê ne. Divê hûn destê xwe li piştê Birêz Yekta Güngör Özden'ê me yê mafparêz, hiqûqnas, kemalist (ku hejmaran wan her diçe kêr dibe) bidin. Ji kirin û karê wan re bi hurmet bin. Bi kurtasî divê hûn çalakî û çespînen wî bişêkirin.

Zana Farqînî.

TÎR

Musa Anter



Diyarbakira xopan

Gotineke Ereban ê pêşiyên heye, dibêje: "El mêt'e weltifil teqûlen hel elrîcal ela kulî şey'in qadîrûn." Bi Kurmancî wiha ye: Pîrek û zarok dibêjin qey zilam karin hemû tiştî bikin.

Ji pêxemberê Ewrûpiyan re dibêjin filozof. Benî-Îsraîl, Ereba, Kurd, Hind û Çîn em ji filozofên xwe re dibêjin pêxember. Niha ji wan pêxemberên Ewrûpî re yekî Alman heye. Jê re dibêjin Kant. Kant der heqê Xwedê de wiha dibêje: "Bê çawa zarokê ihtiyaca dê û bavê xwe jî, ji xwe bi qewettir divê û însan jî qewetek ji xwe mezintir divên. Ha ew qeweta mezin Xwedê ye."

Erê pêxember û Xwedayê me Kurdan bê henek ji milletên hema saxlemtir e. Lê ez dinêrim Amed yanî Diyarbakir jî di çavên Kurdan de nîv-îlahek e. Ez gelekî bûme şahid di hedîsan de û heta bi xwe jî, di wextê xortaniya min de Mêrdînê bajarekî antîpolitîk bû, yanî ne siyasî bû. Îca pêxemberê Yewnanî jî heye; Sokrat dibêje: "Însan heywanekî siyasî ye." Ku siyasî tune be ew însan dibe heywan. Ji ber vê yekê 40 sal li xerîbiyê min fedî dikir ez bibêjim ez Mêrdînê me, min digot: "Ez Diyarbakirî me". Di 52'yan de ez li Diyarbakir, li merkeza Demokrat Partiyê bûm. Şemrexî yanî bi navê niha Mazîdaxlî hatibûn giliyê qeymeqam. Şemrexî aîdê Mêrdînê ye. Başkanê (Serokê) Diyarbakir hevalên min yê rehmetî Edîb Altınakar bû. Ji wan re got: "Birako ne hûn qeza Mêrdînê ne, ez nikarim tiştêkî ji we re bikim herin Mêrdînê." Wan got: "Hahû hahû, yabo em narin cem Mêrdîniyan, em Diyarbakirî ne."

Cih hene, cografya wan jî di dînan de û bi miletan miqedes in. Mesela meheleyek bajarê Roman heye Vatîkanê, bi filehên dinyayê miqedes e. Mekehê û Şama Şerîf bi misilmanan miqedes e. Tewer Qudsê navê wê lê ye, muqedes e bi hersê dînan, yanî bi cihûtî, filehtî û misilmaniye. Ez bala xwe didime Diyarbakir jî, bi Kurdan cihêkî wiha ye. Îca muqedesiya Diyarbakirê ne dîni ye, mîlî û siyasî ye. Di temamê xelqiyeta Kurdan de yanî bi zimanê niha folkloran wan de hema hema di gelek stranên de Diyarbakir heye, Dê û bavekî ku dikeve tengasiyê, gazinan ji Diyarbakirê dike. Wek Diyarbakira şewitî, Diyarbakira xopan, Diyarbakira serberjêr û Diyarbakira xûz. Di vir de stranvan qesta wî ew e ku çima Diyarbakir di hewara wî de nayê.


Bê çawa li piştê diyarekî tu şeqamekê li zarokêkî bixî, zarok dibêje: "Ay yadê" û ya "ay yabo", Kurmancî ku diêşin bi vî awayî li Diyarbakirê dikin hewar ku wan xelas bike. Kesî Kurd li Diyarbakir bû komek kevirên mirî qebûl nake. Ew dibêjin qey Diyarbakir mezinekî wan e bi rih û bi qewet e. Ev hisa Diyarbakirê bi xerîban jî wiha ye. Pîreka Reîsê Cumhûrê Fransa Mitterand hat Diyarbakir. Di nivîsandineke xwe ya din de ezê binivîsim lê, niha dora wê hatiye ez piçîkekê jê bibêjim. Li Diyarbakirê ez û Madam Mitterand diştexilîn, madam ji min re got: "Apo şevên din bi şev ku xelk hemû razan, ez û mîhafîzên xwe ez derketim piçîkekê li nav Diyarbakir geriyam. Ma çi çaqas Diyarbakir xweş bû." Min got: "Lawo ma çi xweşiya Diyarbakira feqîr heye? Tu ji Parîsê yî, mala te li Elîse Saray'ê ye, tu xanima dinyayê jî serek e, ma ev kavîla Diyarbakir çilo bi te xweş hat?" Madamê got: "Na Apo ne wiha, bi navê Xwedê ku ez li Diyarbakir dimeşiyam, te digot qey temamê ax û kevirên wê bi min re dipeyîvin." Wiha saw bi ser min diket. Min ceribandîye ez li Stenbolê bim, li Stîlîlê bim hûn yeqîn bikin ku bêhna min teng dibe û ez bêkêf dibim, saeta ku ez herim Diyarbakir bêyî doktor û dermanan ez rehet dibim. Ma ne ji vî awayî ku ez herim Diyarbakir çavreş in û temamê kuştin û îdamên me li Diyarbakir dikirin ji bo ku Diyarbakir li ber çavên Kurdan reş bibe. Lê wiha nebû. Tewer bi ser de temamê axa Diyarbakirê ji Kurdan re bû cihê şehîdan. Ma kî ne li Diyarbakir e? Hema yên niha Şêx Seîd, Şêx Şerîf, Doktor Fuat Axtî, Salih Begê Hênî û mêvanê wan yê talî Wedat Aydin û Zekiya Alkan û Mazlum Doğan.

5.4.1992

Jûjî...

Doğan Güzel

*DEWLETA KU SERÎ BI GERÎLA RE DERNEKIST VÊ CARE BERÊ XWE DAYE SAZIYÊN DEMOKRATİK...



Kurdên Komarên Sovyeta berê di navbera xwe de komele ava kirin Li Sovyeta berê yekîtiya Kurdan

Welat/Grasnadar- Konferansa damezirandina Komeleya Kurdên Sovyeta berê, bi serfirazî li bajarê Grasnadarê, di rojên 1-5 Îlon 1993'yan de pêk hat. Konferans ji Cumhûriyeten Federasyona Rûsya, Kazakîstan, Azerbeycan, Gurcîstan û Ermenîstanê, bi tevlibûna 47 delegeyên bijare kom bû.

Li Cumhûriyeten Sovyeta berê, nêzi milyonekî Kurd dijîn. Lê mixabin Kurd bê serokatî û bê rêxistin in. Di nav gelek problemên ekonomîkî, siyasî, civakî û kulturî de dijîn. Roj bi roj ber bi asimilasyon û windabûnê ve diçin. Bi pêşveçûna şerê rizgariya neteweyî ya Kurdistanê û bilindbûna yekîtiya neteweyî re di nav Kurdên Sovyetê de jî germbûnek dest pê kir. Lê ji ber ku rêveberiyek xurt nîn bû, hêza wan parçe parçe mabû û di nav cumhûriyetan de li hember problemên giran bexwedî bûn.

Ji bo çareserkirina pirs-girêkên xwe û yekgirtina nete-



Konferansa Komela Kurdên Sovyeta berê rewşenbîrê mezin doktorê zarokan Prof. Dr. Seidê Îbo, ku di sala 92'an de şehîd ketibû wek endamê Komîteya Navendî yê Rûmetiyê hilbijart.

weyî, avakirina rêxistinek Kurdan pêwistiyek girîng bû. Konferans, bi damezirandina Komeleya Kurdên Sovyeta Berê yekîtiya xwe ya neteweyî bi xurtî anî ziman û bû nîşanek yekîtiya Kurdên Sovyeta Berê.

Konferans di dema germiya şerê serxwebûn û azadiya Kurdistanê ya ku di bin serokatîya PKK'ê de dimeşe pêk hat. Kon-

ferans bi her cureyî piştevaniya şerê serxwebûn û azadiya gelê Kurdistanê girt û rizgarbûna xwe û çareserkirina pirs-girêkên xwe di serxwebûn û azadiya Kurdistanê de dît. Mesaja girêdanîyê ya bi serokatîya têkoşînê re ku hate şandin bû nîşana piştgiyaya Kurdên Sovyetê.

KONFERANS Û KURDISTANA SOR

Konferans bi naverokeke dewlemend kombûna xwe domand. Li ser gelek pirs-girêkên mezin hate rawestandin û biryarên girîng hatin standin. Rapora Siyasî bi kûrahî hate guftûgokirin. Piştî rûxandina sosyalîzma reel ji aliyê imperyalîzmê ve li hember gel, li hemû herêman şerekî diwar tê meşandin û gel ji taqetê dixînin. Dû re, imperyalîzm bi navê Hêzên Navneteweyî ên Yekgirtî herêman dixebîndî xwe. Parçeyek ji vê siyasê jî, li Kafkasyayê bi rê ve dibin û pirs-girêkên gelên Kafkasyayê kurtir dikin. Konferans daxuyand ku, pirs-girêkên gelên Kafkasyayê incax bi esasên yekîtiyê, biratî, aşî û demokrasîyê çareser dibin. Gelê Kurd jî, ji şerên li Kafkasyayê gelek ziyar dîtîye. Bi taybetî jî şerên di navbera Ermenîstan û Azerbeycanê de, Kurd carekê ji cihên xwe hatin derxistin. Şerê Qerebaxê îro bi temamî li ser Kurdistana Sor dimeşe, bajarî û gundiyên Kurdistana Sor hatine koçberkirin û avahiyan wan hatine wêrankirin. Konferans daxuyand ku, pirs Kurdistana Sor divê bi aşî û demokrasîyê çareser bibe, şerên li



Kurdên Gurcîstanê li bajarê Tiffîsê di şadîmanîya Newroza 93'yan de.

herême bêne rawestandî û gelên koçberbûyî vegeirin ser axa xwe.

Di dema ku Konferans didomiya de, hikûmeta Kirgîzîstanê ji nû ve Kurd sirgûn dikirin û ji cihên wan derdixistin. Li ser Kurdan kirinên li dijî mirovahiyê dimeşandin. Konferans li ser rewşa Kurdên Kirgîzîstanê sekinî û tewra hikûmeta Kirgîzîstanê mehkûm kir.

REWŞA KURDÊN QIRGIZÎSTANÊ

Di van salên dawî de, Kurdên Ermenîstanê, Azerbeycanê, Ozbekîstanê û Qirgîzîstanê hatine koçberkirin û li bajarên Federasyona Rûsyayê kom bûne. Konferans li ser pirs-girêkên wan ên ekonomîk, civakî û kulturî sekinî û daxuyand ku, divê hikûmeta Federasyon a Rûsyayê mafên jiyana civakî û kulturî ji Kurdan re binase û ji bo koçberiya Kurdan raweste giraniya xwe bide nîşandan.

Piştî pejirandina Rapora Siyasî, program û destûra komeleyê qebûl bû. Ji bo birêxistina komeleyê, Kurdên ji her cumhûriyê i karên girîng dane ser xwe û li ser rewşa Kurdên Sovyetê, şandina deklarasyonên siyasî, ji bo teşkilatên navneteweyî û cumhûriyê ên Federasyona Rûsyayê, Kazakîstanê, Azerbeycanê, Ermenîstanê û Gurcîstanê qebûl kir û li ser problemên Kurdan ên ekonomîk û jiyani jî

hate sekinî. Bi dewlemend û tucarên Kurdan re danîna têkiliyan ji xwe re armanc danî û ji bo Kurdên rewşa wan a aborî nebaş, avakirina komîteyên hevkarîyê wek armanceke esasî dît û ji bo Kurdên Sovyetê, asimilasyonê talûkeyek mezin dît. Ji bo pêşîya asimilasyonê bê girtin, pêşxistina zimanê Kurdî, edebiyat û kultura Kurdî bê xwedîkirin, berhemên ku têne weşandin bîn zêdekirin, çapkirin û belavkirin.

HEVKARIYA ÇAPEMENIYA KURD

Konferans, li ser pirs çapemenî û enformasyonê jî bi giranî sekinî. Ji bo rojnameyên ku li cumhûriyetan têne çapkirin, wek Dengê Kurd, Botan, Riya Teze, Kurdistan News bêne xurtkirin û di navbera wan de hevkarîyê bê sazîkirin, rojnameya Kurdistan ji nû ve bê weşandin biryar hate standin. Li gor biryara Konferansê, divê hemû çapemenî li der û dora rojnameya Kurdistan Report kom bibin û Kurdistan Report bibe organek navendî û di navbera cumhûriyetan an de, roleke merkezî ji bo çapemenî û enformasyonê bilîze.

Delegeyên Kurd li ser pirs hebandina dîni jî rawestiya. Siyasetên dijîminên gelê Kurd ên ku hebandina dîn ên weke misilmanetiye, êzîdîtiye weke hacetêke parvekirinê dibînin. mehkûm kir. Konferans hurmet û rêzên xwe ji dînan re pêşkêş kir û daxuyand ku, ne misilmanî, ne şîitî, ne êzîdîti û ne jî elewîti nabe sedemê ku gel ji hev bêne parçekirin; welatê me Kurdistan e û em yek millet in.

Konferans, rewşenbîrê mezin doktorê zarokan Prof. Dr. Seidê Îbo, endamê Komîteya Navendî ê rûmetiyê hilbijart. Şehîdê riya serxwebûn û azadiya Kurdistanê Cewoyê Abdal, Qehremanê Kurdên Sovyetê îlan kir. Mihe-medê Silo (Babayef) ji ber xizmetên di ber gelê xwe de pêk aniye, bi Endamiya Komîteya Navendî yê Rûmetê hate xelatkirin.

Konferans, di kutasiyê de ji bo komîteya navendî 11 endam hilbijart û Konferans bi serfirazî qediya.

ROJEVA WELÊT

Kurd yekîtiyê hîn dibin

Têkoşîna rizgariya gelê Kurd, têkoşîna hebûn, vejîn û yekbûna neteweya Kurd e jî. Gelê Kurd, bi berxwedana xwe ya li hember dagirkeriyê û bi têkoşîna xwe ya çêdar, di riya welatekî azad de gavên girîng diavêje. Ev têkoşîn her ku bi pêş dikeve, dibe hêviya hemû Kurdên ji hev parçebûyî û belavbûyî jî.

Têkoşîna bakurê Kurdistanê, di riya yekbûna Kurdên li çar parçeyan û Kurdên Komarên Sovyeta berê de jî, bûye hêviya serfiraziyê. Îro Kurd tevî hemû zehmetî, qetlîam û koçberkirinan, bi baweriyê xurt, bi nêrîneke ron û bi hêviyê mezin li pêşerojê dinêrin. Dizanin ku riya yekîtiyê û serxwebûnê vebûye û tu hêz nikare xwe li ber lehiya şoreşa Kurd bigire.

Kurdên ku li Komarên Sovyeta berê dijîn jî, cara yekemîn bi hêviyê wiha xurt tene dagirtin û bend û zincîrên mejiyê xwe dişkênin. Ji demê ve ye, Kurdên Sovyeta berê, di riya tev-girêdana bi têkoşîna bakurê Kurdistanê re de, gavên girîng diavêjin. Weke tê zanîn, di hilbijartinên ji bo Meclîsa Neteweyî de, ji Komarên Sovyetê bi deh hezaran Kurd dengên xwe dabûn û bi çoiseke mezin, 7 mebûs şandibûn Meclîsa Neteweyî. Îro jî, di riya avakirina yekîtiyê di nav Kurdên Komarên Sovyeta berê de, gavên pîroz diavêjin. 47 delegeyên bijartî, ji komarên Kazakîstan, Azerbeycan, Ermenîstan û Gurcîstanê, di navbera rojên 1-5 Îlonê de, li bajarekî Rûsyayê, li Grasnadarê civiyan û ji bo avakirina komeleyê yekgirtî biryar standin. Konferansa ku ji bo avakirina vê komeleyê civiyabû, bi mesajên xwe yên der barê têkoşîna bakurê Kurdistanê de jî, tev-girêdana xwe ya bi vê têkoşînê re îlan kirin. Em jî di van xebatên pîroz de, ji bo birayên xwe yên Kurd serfiraziyê dixwazin û diyar dikin ku serkeftina wan a me ye jî. Li Kurdistanê, gerîla li hember hêzên leşkerî êrişên berfirehtir pêk tîne. Dewlet, di êrişên xwe yên ser Çiyayê Tendûrekê û der dorê wê de, bi dehan leşker û helikopterek wînda kir. Êrişên li hember gundan ên ku bi armanca valakirina gundan pêk tên jî didomin. Tevî gundan daristanên Kurdistanê jî tene şewitandin. Li aliyê din, dewlet ber bi zivistanê ve amadekariyên qetlîameke girseyî dike. Bi vê armancê, ji bo dengên muxalîf û kesên li dijî şer rawestîne, êrişên li hember partiyên legal, sazî û weşanên demokratîk diwartir dike. Ev pêkutiyên faşîstî bi giştî li hember Partiya Demokrasiyê (DEP) û rojnameya Özgür Gündem'ê pêk tîne. Mehkemeyên Özgür Gündem'ê yên ku ji bo girtina wê hatibûne vekirin taloq bûn. Dê ev mehkeme di 28'ê Cotmehê de bidomin. Serokê DEP'ê Yaşar Kaya, ji ber axaftina xwe ya di Kongreya PDK'ê de hate girtin. Girtina Yaşar Kaya, tewra hikûmetê ya li hember kampanyaya DEP'ê ku bi slogana "Aştiya Topyekûn" didomandin, nîşan dide.

Dewlet aştiyê naxwaze. Ji bo bikaribe qetlîamên xwe bidomîne jî, pêşî dixwaze xwe ji dengên muxalîf rizgar bike. Di vê de karê sazî û komeleyên demokratîk, rêxistin û hêzên sosyalişt, bi taybetî ji ya DEP'ê bi xwe ew e ku, dengên xwe bikin yek û bilindtir bikin. Ji dewletê re zemîna qetlîaman nehêlin û li hember bisekinin.



Kurdên Rewanê di xwepêşandaneke ji bo piştgiyaya têkoşîna rizgariya neteweyî ya bakurê Kurdistanê de tîne dîtin.

Ralif Ekiyos: 'Serdaniy Iraq dekem'

(Zaravay Sorani)

Navenda Nûçeyan- Ralif Ekiyos serokiy ew komîtiyey netewe yekgirtuwekan ke taybete be damalîniy çakiy qedexe kiraw le Iraq diway kobûnewey xoy legel wezîriy derewey Frensa gutiy: "Witûwêj le barey newtiy Iraqewe be pêy biryarêkiy Iraqî halwasra," her wiha gutiy: "Eger pirsîy Amêrekaniy wêne girtin yekla bibêtewe rene serdanêkiy Iraq bikem."

Herweha Akiyos le wêlamiy pirsîyarêkiy rojnemey AL HAYAT da gutiy niyaziy em serdaney Paîs man eweye ke hikûmetiy Frensa agadariy peresendiniy nwê bê le Iraq da, dîsanewe gutiy eger pirsîy em amêraney wêne girtin tewaw bibê ewa le mangiy tiştîniy yekem da rûdekate Bexda.

Herweha le kotayî serdanekeyda bo Paîs, Ekiyos raygeyand kewa "barûdoxiy Iraq zor nalebare, belam" gutiy "Hiç zaniyarîyekim le barey başûrewelber dest da niye."


DEP hedefa dewletê ye

Navenda Nûçeyan- Serokê DEP'ê û xwediyê rojnemeyê Özgür Gündemê Yaşar Kaya, ji ber axaftina xwe ya di Kongreya PDK'ê de, li Enqerê hate girtin. Yaşar Kaya roja 15'ê İlonê ji aliyê polîsan ve ji otela ku lê dimîne hate binçavkirin û dotira rojê jî, li Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) hate darazdin. Piştî darazdinê, mehkeme biryara girtina Yaşar Kaya da û ew şand girtîgehê.

Girtina Yaşar Kaya, ji aliyê hiqûqzanan ve wek biryareke siyasî tê nixandin. Di rastiyê de jî, pêkutiyên li ser DEP'ê, parçeyek ji şerê qirêjî yê ku li Kurdistanê tê meşandinê ye. DEP ji roja avakirina xwe ve, nêzîkî 50 şehîd daye, bi hezaran endamên ve partiye jî, ji îşkenceyan derbas bûne û hatine girtin.

Mebûsê DEP'ê yê Mêrdînê Mehmet Sincar jî, di nav karwanê şehîdan de ye û piştî kuştina Mehmet Sincar, êrişên li hember DEP'ê tundtir û diwartir bûbûn.

Cigirê Serokê Giştî yê DEP'ê Murat Bozlak, di daxuyaniya xwe de, girtina Yaşar Kaya wek biryareke siyasî nixand û ve tewra dewletê protesto kir. Murat Bozlak, di daxuyaniya xwe de bi kurtî wiha



Serokê DEP'ê Yaşar Kaya li Enqerê ji aliyê DGM'ê ve hate girtin

dibêje: "Serokê me yê Giştî Yaşar Kaya, bi hinceta ku, di axaftinên xwe yên berê de, sûc kiriye, hate girtin. Weke tê zanîn biryara girtinê ji bo tedbîra îhtiyatî ye. Lê cihê serokê partiyeke siyasî, xwediyê rojnemeyê Özgür Gündemê û endamê PEN'a Navneteweyî Birêz Yaşar Kaya kifş e. Weke tê zanîn mebûsê partiya me yê Mêrdînê Mehmet Sincar demekî berê li Batmanê

hatibû kuştin û cenazeyê wî nedabûne me. Ji ber van yekem em dibêjin ku, ev biryar siyasî ye, biryareke neheq e, em dê îtiraz bikin."

Li aliyê din, biryara girtina Yaşar Kaya, kuştina Mehmet Sincar û endamên kargêriya DEP'ê yên Batmanê, pest û pêkutiyên li ser DEP'ê bi giştî, bi kampanyaya DEP'ê yê ku, wê dawiyê bi slogana "Li hember şer aştîya topyekûn"

ilan kiribûn ve tê girêdan. Ev kampanya ji aliyê sazî, komik û komeleyên demokratîk û raya giştî ve destekeke mezin dîtibû û ev jî, dewletê di meşandina şerê qirêjî de dixist tengasiyeke mezin. Ji ber vê yekê jî, êrişên xwe yên li hember DEP'ê diwartir kirin, da ku DEP nikaribe wê kampanyayê bimeşîne.

MEHKEMEYA GIRTINA ÖZGÜR GÜNDEM'Ê TALOQ KIRIN

Mehkemeyên ku ji aliyê DED'a (DGM) Stenbolê ve, ji bo girtina Özgür Gündemê hatibûne vekirin, bêtî ku, biryarek bê girtin hatin taloq kirin.

Ev 11 mehkemeyên ku ji ber nivîsên di Özgür Gündemê de hatine weşandin didomiyên, taloqî 28'ê Cotmehê bûn. Di vê mehkemeyê de, berpirsiyarê nivîsaran ê Özgür Gündemê yê berê Şeyh Davut Karadağ ku, niha di girtîgehê de ye, berpirsiyarên rojnemeyê, ji bo parêziyê 9 evûqat û bi dehan kesên ku ji bo piştigiriyê hatibûn, amade bûn. Xwediyê rojnemeyê Yaşar Kaya, ji ber ku, li Enqerê hatibû girtin beşdarî mehkemeyê nebû.



Greva Gündem'ê didome

Navenda Nûçeyan- Greva xebatkarên Gündemê ji bo ku pest û pêkutiyên li ser rojnemeyê bînin hianîn, çavsorîya dewletê der heqê radana rojnemeyê de dawî lê bê û nûçevanê wê Aysel bê dîtin, greva birçûbûne didomînin.

Grev bi beşdarbûna gelek mirovên demokrat, pêşverû û welatparêz bi piştigiriyek xurt ber bi roja 90'an ve dimeşe. Ji xebatkarên Gündemê Gönül Özdemir (Ji servîsa çand û hunerê), Halil İncesu (Kafîkaturîst) Yurdusev Özsoğmen (Berpirsyarê

servîsa karker û sendîqayê) dest bi grevê kirin. Ji bo piştigiriyê jî nivîskar Haluk Gerger, ji muzîsyenên NCM'ê Şêxmus Erteci û Uysal Sönmez, ji Komîsyona Jinan a DEP'a Kadıköyê Semra Gürbüz, ji Komîsyona Ciwanan a DEP'a Maltepe du kes (navê wan nekifş e) û ji xwendevanên Gündemê jî Serap Mutlu, Mevlûde Acar ketin grevê.

Hinek kes jî bi serlêdan û mesajên xwe daxwazên xwe yên serkeftinê û amadekariya xwe ji bo piştigiriyê tînin zimên.

Mebûsê DEP'ê Mahmûd Alinak:

'Êdî zarokên me jî qeyd nakin'

Navenda Nûçeyan- Mebûsê DEP'ê Mahmûd Alinak daxuyand ku, lawê xwe ji bo qeydkirinê biryare çend lîseyan, lê ew nepêjirandine. Li ser yê yekê Alinak roja 13'ê İlonê pirsyarnameyek da Serokê Meclîsê û ji bo ku, ji aliyê Wezîrê Perwerdekarîyê ve bersivandin.

Alinak li ser vê bûyerê ji rojnemeyê turkish daily news'ê re wiha got: "Min hewl da ku, ez lawê xwe yê 16 salî Halit Sınan bibim li dibistanekê bidim qeydkirin. Lê em çûm çend dibistanan wek lîseyên Ayrancı, Çankaya, Tinaztepe û Mimar Kemal, dema bihîstin ku ez mebûsê Şîrnexê me ew nepjirandin û ser de jî Geñnendeyê (mudir) Lîseyê Çankaya berî me da û di telefonê de Cigirê Geñnendeyê Lîseyê Mimar Kemal Oğuz Erol, ji min re got "Lawê xwe bişîne herema xwe ji bo xwendinê."

Alinak ev şêl û tevger wek tiştê nebaş nixand û wiha got: "Heke wan bi çavê dijminan li Kurdan nehîrtina ewqas gels çenedibûn.

Heke ev tişt nebe tu gels



Mahmud Alinak, li hembêr helwesta midûrên lîseyan hêrs bû

namînin. Jixwe Tirkê ku ji Kurdan hez neke ji Tirkan jî hez nake û her wiha ev tişt ji bo kesên Kurd jî derbasdar e."

Alinak di pirsyara xwe de ji wezîrê Perwerdekarîyê ew pirs kir, "Gelo ev tevger ne cudaxwaziye, ev kesên ku bi baca hemwelatîyan kar dîkin çawa karin gotinên wisa bikin?"

Mebûsê Partiya Demokrasiyê Mahmûd Alinak di

dawiya axaftina xwe ya bi daily news'ê re got ku, ji bo bavekî ev tişt dilêşiyêke giran e, ku mirov nikaribe zarokê xwe di dibistanekê de cîwar bike. Piştî li ser rawestina daily news'ê Geñnendeyê Lîseyê Çankayayê Seyfettin Şahin got ku, "çewt tîgîhîstin" çêbûye û wî nezaniyê ku ev kes Mahmûd Alinak e. Xwest ku lawê xwe bîne ew qeyd bikin.

Hevlingê min ê delal

Firat Ceweri

Havîna par jî gava ez hefteyekê mêvanê te bûm, min barê te yê giran û xebata te ya ji dil dîtibû. Li mala te zire zira telefonan bû. Her kesî, ji bo her tiştî xwe li te û li hevalên te digirtin. Ew bêçare bûn, hûn heviyên wan bûn. Hûn wekîlê wan bûn. Bi ya wan, her tişt ji destê we dihat. Lê te êvarekê piştî şivan ji min re gotibû ku, fersend têkeve destên wan, ew dê we bikujin, an jî îdam bikin. Di wan heft rojên ku ez mêvanê te bûm de, em tenê du-sê caran rûniştibûn û me sohbet kiribû. Tu her meşgûl bûy. Tu rojekê li vî bajarî, yekê li bajarê din bûy. Te digot, gel zilmê dibîne, zarokên wan tene kuştin, gundên wan wêran dibin, malên wan dişewitînin, me divê wan bi tenê nehêlin. Em bi dengê wan hatine vir, divê em li derdê wan guhdarî bikin. U ji bo guhdarîkirina derd û kulên wan tu her roj li ser riyên bûyî. Ji bo ku te zêde wext nedîtibû ku, tu bi min dakevî, mîna ku tu li ber xwe diketî. Lê ez ji te memnûn bûm. Mihemed! Di şexsiyeta te de dostanê û hevaltiyê germ û ji hebû. Min ev yeka hanê hê ji rojên Diyarbekirê ferq kiribû. Tê bîra te, gava em li mala te ya li Baxlêra, heya bi derengiyê şevê rûdiniştin û me li ser rewşa welêt û hevalên li Ewropayê sohbet dikir? Te alîkarî ji me dipa, te xebat ji me dipa. Ez paşê têgihîştibûm ku, te 2 birayên xwe yên mîna çiyên wînda kiribû. Herdu jî di rîya ku, tu tê de şehîd bûyî, şehîd bûbûn. Dilê te yê nazik birîndar bûbû, kîndar bûbû. Te nerazîbûna xwe ya li hemberî dewletê dianî ziman. Lê dîsan jî tu, li rîyê aştiyê digeriya. Ev aştiwaziya te vê dawiyê me di rojnameyan de jî xwend. Tu bi hevalên xwe re li dijî şer derketibûyî nêçira aştiyê. Te nedixwest xwîn birije, mirov bêne kuştin, jin jinebî, zarok sêwî bimînin.

U tu zanî Mihemed, wê rojê hevalekî ji min re telefon kir. Wî li radyoya BBC'yê guhdarî kiribû. Ji min pirsî, bê navê hevlingê min yê parlementer çi ye. Gava ku min got: "Mehmet Sincar e." wî bi dengê xemgîn sersaxiya min xwest û da xuyakirin ku, tu li Batmanê hatiya kuştin. Wê hengê telefon ji destê min ket, ez di cihê xwe de sar mam. Baldûza te bi ser min de hat, "Çi bûye?" got. Deng ji min derneket. Ji lerizandina lêva mina jêrê dê ferq kiribe ku, tiştê ne li rê bûye. Lewma qêrîn pê ket. Gava min rastiya jê re got, qêrîna wê di felekan de derket.

Erê, tu hatibû kuştin, tu ji gulleyên kor re bûbûyî qurban. Xwedêyo, ev çi cenawir in? Çawa destê wan li te geriya Mihemed? Ma wan nizanibû ku, tu peyayekî nazik, dilpak û mirovhez bûyî. Dibe ku, ji ber vê yekê wan tu kuştin, tu di nava xwînê de vegewizandin. Ji wan kirî ku, ew dê bi vê yekê welatê te û hemwelatîyên te di nava şîn û heznê de bihêlin. Bi slogan dibêjin ku, diya te reş girê nedaye, çarika sipî daye serê xwe. Keçên sipehî yên berzewac, bûkên nûcewî, û pîrejînan ji bo te lîlandine. Apê Tewfîq ku, ew jî wekî kalîkê te "Bavê seyro" bedew û çeleng e, îro yek ji bavên welêt ê herî serbilind e.

Mehemed, niha, piştî mirina te bi hefteyekê komek rojname li ber min e, ez li wan dinihêrim. Di hemûyan de resmên te hene. Pirraniya bend û nivîsaran li ser te ne. Ji her cih û deveran sersaxiyên bi pesin hene. Di rojnameyekê de resmê te çiqas xweş derketiye. Xetên rûyên te nerm, dostane û ji hemû xerabî, kirêtiyan dûr in. Di bin vî resmî de jî resmekî Cîhanê heye. Rûyê wê bi hêstrên dilê wê hatiye şûstin, sor bûye. Ew dibêje: "Ji bo çi mêrê min kuştin? Ma xerabiya wî gihîştibû kê?"

Ez radihêjim telefonê û ji wê re telefon bikim, dilê wê xweş bikim, piştgiriya xwe nîşan bidim. Jê re bibêjim ku, em dê wê bi tenê nehêlin. Lê gava ez telefonî dikim, zimanê min nagere, ez nizanîm bê ez dê çi bibêjim, çawa dilê wê xweş bikim. Lê ew min aş dîke, ew dibêje ku tu di ber welatê xwe de şehîd ketiyî. Mehemed ew te dike malê hemû gelê Kurd. Rast e, tu malê hemû gelê kurd î. Bûyera kuştina te welat hejand. Lê bû sedemê yekîtiyê û berbîhatîneke xurttir û tekûztir. Her Kurdên bi rûmet xwe hedefa wan gulleyên sar ku li bedena te ya germ ketine, dibînin. Ji hev re soz didin ku, ew dê te bi eynî germahiyê bi birînin. Erê, em dê te di dilê xwe de bijînin.

Riya kor

(Kurteçîrok)

Pîr Rustem

Bi daketinê re, serî li keviya derî ket, hin niçenîç ji kesên rûniştî hatin û bêyî ku li wan vegere xwest bi lez çaterekê bibirre. Ket ser resîfê çepê û serî weke her tim bi ser sîng de lûskirî. Lîngan rê ji ber kirine, ew dizanin ku, divê du sed û bîst û sê gavan biavêjin heya ku, bigihin ber pêpelûkên ku, dertên Çiyayê Seydo. U dema ku gava bîst û çaran, piştî du sedî ling, bêhtir hilda, lê ew neket ser pêpelûkê û bi hêz hate xwarê. Hişt ku ew serê xwe hilde. Çav gerandin, lê Taxa Çiyayê Seydo wînda bûye.

Çav di serê H. Memo de ziwabûn û hin çilpikên xwedanê ji cênîkan herikîn. Wî dizanibû ku, pîr tişt di jiyane de tene guhertin... Windakirin û yek karê hin nimûneyan bîne ber çav. Wek em bibêjin windabûna çend kesên ji gundê wî di navbera şev û rojekê de, windabûna poz ji rûyê wan û hin tiştên din ên biçûk û veşartî. Mîna ziman û çend gotinên zêde xistibûn ferhengan, wek gotinên "azadî", "mîrovahî", "serbilindî" û hwd. Belê H. Memo carekê ji devê kalemêrê bihîst ku welat jî wînda dibin. Lê wî tu pêwistî neda gotinên kalemêr û got: "Evê han xerifiye, nîzane çi dibêje."

Çênabe, wîlo çênabe. Ev li dijî newamîsê siruştê ye Na, ev xewn e." Xwe carekê quncirand û fêr kir ku ne xewn e. Xweş tê bîra wî ku ji vî sibehê ve, bi ku û ku ve çû û hat. Heya berî du katijmêran

(saetan), dema ku gihîşt sîryana kevin û li ba hin dostan şevbihêrka xwe derbas kir û piştî ku piyaleya sisêyan bi serî kir, xatir xwest. Derket ser rîya daîreyê û li pêş fabrikeya sîngan ji salonê peya bû. Heya serî li keviya derî ket û hin niçenîç li dû xwe hiştin, ew bi temamî di mejî de vegehand bêyî ku gava bîst û pêncan biavêje.

Piştî ku H. Memo ji nişkave bi bûyerê şiyar bû, çend caran bi kerb çav miz dan. Ne dîr e ku çav jî dixwazin lîskêkê binin serê wî, lê bêsûd bû. Dî dîwar û rîya di navbera wan de heya çavên wî dibînin dirêj kiriye. Ew dike nake dawîya rê bibîne, lê bêçare ye. U taxa Çiyayê Seydo wînda bûye. Bi naskirina vî yekê re wî pişt da dîwarê ku, di ber re dimeşiya. Belê dizane ew dîwar û yê li hemberî wê yên di goristanên kevin in. Yek ji dema ku hin poz di cîhanê de hebûn mabû û ya din jî, ji dema mirovên bêpoz peyda bûn hate avakirin. Ew van herdu goristanan xweş dinase. Heya rojekê di nivê şevê de hat û xwe xist hundirê tirbeke vekirî, ji yên bi poz. Lê dema ku dît goştê di navbera dev û herdu çavên wî de diwerime, ji wan deran revî. Lê, her ku nêzikî li mal dikir, bêhnek genî ew dipêça. Gava sibehê ji mal derket û her ku yê çav bi rû-dême wî diket, xwe jê bi dîr dixistin. Hevalên wî li daîreyê, piştî ku ew derbasî odê bû, bêyî ku silava wî vegehrînin ji odê bazdan û gihîştin midûrê xwe. Jê re gotin ku, pozê hevalekî wan çêbûye. Di

cih de wî rahişt telefonê û hin gotin di şirîtan de ziwa nebûbûn. Otomobileke reş, li pêş deriyê daîreya ku H. Memo tê de kar dike, disekine û ji wê rojê ve, navê wî ji çî kaxezên ku di bajarê wî de hebûn wînda dibe.

-Te çi li ber dîwêr wînda kirî? Gotinên ziwa û di bêhna kufikê de ketin guhên wî. Lê dîsa jî hin hêvî di dilê wî de bişkiwandin. Bi baweriya ku, bi zivirandina xwe re û dema berê wî bi rîya daîreyê bibe, wê rûyê mirovekî zer bibîne. Lê heya ku çav dibînin, rê û dîwarên herdu goristanan diherikin, ne rîya daîreyê maye û ne jî fabrikeya sîngan.... Hemû wînda bûne, rê tazî maye, ne dar û ne jî dirêkên elektrîkê, her ew bi tenê bêdengiyê diçirîne. Çav bi jor ve hildan û dît ku, heyv bi devkenî li wî dinihêre û bi rûyekî sar di ser wî re dibore.

-U te çi di heyvê de wînda kirî? Gotin û dengên berê dîsa dikevin guhên H. Hemo û vî carê di gelêdana ser mil. Gava li wî kesî zivirî, çend didan ji dev weşî. Qoqekî stûyê xwe di ser dîwêr re dirêjkirî.

-Ev bû du sê car ez deng li te dikim û deng bi te nakeve... Çi bi serê te hatî? U bi gotinên xwe re ew derdiket ser dîwêr. H. Hemo bala xwe daye ku hêkel bi temamî derket ser dîwêr û dest ber bi wî dirêj kir. "Ka destê xwe!" U bêyî ew zanibe çi dibe destên wî bi jor de hildikişin û bi alîkariya qoq ew jî dikeve hundirê goristana kesên bi poz.



Hejmara nû ya Rewşen'ê derket

Servîsa Çandê - Kovara çandeyî, wêjeyî, hunerî û zanîyî ya Navenda Çandê ya Mezopotamya Rewşen, bi hejmara xwe ya 11. a meha îlonê kete nav cîhana weşana kurdî.

Di hejmara nû de nivîsên cur be cur balê dikîşînin ser xwe. Kalê Ciwan, bi nivîsa "Sedsaliya Mîrê Rewşenbîran: Mîr Celadet Berdirxan" li ser himdarê alfabeya Kurdî ya Latîni radiweste, Feqe Huseyn Sağniç bi nivîsa xwe ya bi navê "Serlêdana Başûrê Kurdistanê" çavdêriyên xwe li ser başûrê Welêt dinivîse. Addurrahman Durre bi navê gotara xwe ya "Kurd û Kurdistan" ê li ser dîroka Kurdî radiweste.

Adîl Baran, bi nivîsa xwe ya "Peyv û qurmên wan" wateya peyv û gotinan vekolaye. Firat Cewerî bi navê "Çend gotin li ser zimanê Kurdî" balê dikîşîne ser gelê û gengeşiyê ku li ser zimên hatine kirin. Feqe Huseyn di vî hejmarê de jî nivîsên xwe yên der barê "Ziman û Rastnivîs" ê de didomîne. Şükür Gülmüşbi nivîsa "Dil Kurd Ziman Tirk" di hejmarê de cihdîsîne.

Lawikê Silqîroş, çîrokeke Samed Behrengî ye. Behrengî ji Têwrêza Azerbaycanê bûye û di sala 1968'an de, ji aliyê hêzên kevneperest ve hatiye kuştin. Bi çîrokên xwe gelek navdar e. Felat Dilgeş wergerandiye. Di vî hejmarê de çîrokên din jî hene. "Kuştina wî Dîvê" ya Burhan Erdem û "Zilan û Şilan" ya wênekar Fevzî Bilge. Di beşa şanoyê de listika Huseyn Kaytan "Ji mirinê vege tune ye" heye. Bi zarovayê Soranî hevpeyvînek bi wênekar İsmail Xeyat re û senaryoya Sîrwan Reşîr "Zemawendî Pêşmerge"

Di beşa "Danasina Pirtûkan" de Cemîl Gündoğan pirtûka Robert Olson a ku di nav weşanê ÖZ-Ge'yê de bi Tirkî bi navê "Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Sait İsyani (1880-1925) (Kanên Netewekariya Kurdî û Serhildana Şêx Seîd (1880-1925) bi xwendevanê Rewşenê bi Tirkî dide naskirin.

Her wiha Rewşen cih dayê Rapora Enstîtuya Kurdî ya der barê civînen li ser alfabeya Kurdî ya Latîni.

'Ta mirinê şagirtê hunerê me'

Em li ser navê rojnameya Welat spasiyên we dikin ku, we deriyê xwe li me vekir û daxwaziya me ya hevpeyvînê qebûl kir.

Ez pîr şanaz dibim ku, rojnameya Welat derê rûpelên xwe li min vedike û cih dide min. Ez xêrhatineke germîn li we dikim. Hêviya min ew e ku, ev hevpeyvîn hem ji bo xwendevanê Welat û hem jî, ji bo sazî û sazgehên Kurd bi kêr were.

Dema ku hûn navê bakurê Kurdistanê dibihîsin, çi bi bîra we dixê, hûn çi diramin?

Bakurê Kurdistanê beşeke taybetî ye ji bo bazinên min ên ku, ez rûmetê didimê. Berê ev beş ji bo min, wek xewn û xeyalekî dîr bû. Lê bi guherinên nû re li ser rewşa dinyayê ku li bakurê welêt jî reng daye, ew giyana mirî jî zindî dike û hêviyên min taze dibin ku, ez bikaribim di warê lêkolinên hunerî û şirovekirina folklorî de û li ser xwezaya (sirûşt) Bakur wêneyan çêbikim û bedewiyên wê bidime nişan.

Hunerê resen (bi esil) kîjan e? Kîjan hunermend dikare li nav gelên dinyayê bibe nûner û berdevkê gelê xwe?

Hunerê resen ew e ku, temaşekar ber bi xwe ve bikişîne, nehêlê jê re biyan bimîne, hundirê wî geş bike û bike ku bi xwe û bi gelê xwe şanaz bibe. Ev tişt bi tenê di kar û karîna hunera realîzmê de heye. Lê hûnera bazirganî, şermezarî ya pûç û bînaverok a Ewropaya Rojava nikarê vê erk û peywira pîroz û xwegirtî pêk bîne. Hunermendê ku li qada cihanê dibe nûner û berdevkê gelê û welatê xwe, erka ser milê wî sed qat ji yê nûnerên dîplomasiyê mezintir e.

Hûn li welat digerin, bi makineya wêneyan dîmenan dikişînin û ji xebatên xwe yê hunerî re dikin çavkanî û jêderk. Ev kar, ji bo hezkirina we ya ji bo huner e an jî, ji bo hezkkirina welat e?

Ev geşt û gerên min di sala 1961'an de li Stenbolê dest pê kiriyê. Ez heta niha ger û geşt xwe ya ji bo rastî, naverokên heqîqî, rindiya mirov û sirûştê destbikar im. Ez xebatên xwe yê berê (destpekî) hin car bi sikêçî

Jînenîgariya Mihemed Arif

Di sala 1937'an de li bajarê Rewandizê li Eyaleta Hewlêrê ji diya xwe bûye. Li sala 1956'an xwendina xwe li Xwendîgeha Pîşeyên Bedew kuta kiriyê. Li Akademiya Hunerên Bedew a Moskovê di sala 1967'an de xwendina masterê qedandiye. Li Akademiya Hunerên Bedew li Bexda û Babilê mamosteyî kiriyê. Niha li derve, li Zanîstgeha Selahedîn ders dide û karê xwe yê hunerî didomîne.

Di Sala 1961- 67'an de sê pişengehên xwe yê ferdî li Sovyetê vekiriyê. Di navbera salên 1971- 84'an de li Bexdayê jî çar pişengehên xwe yê ferdî yê din vekiriyê. Her xwekî din li derveyî Iraqê beşdarî gelek pişengehên navneteweyî bûye. Wek li Sovyet, Fransa, Îngilîstan, Hindîstan, Almanya Rojhelat û Rojava.

Pirtûka wî ya bi navê "Hunerê Hêlkarî" bi zaravayê Kurdî ya Soranî û bi Erebi hatiye çapkirin. Sê pirtûkên li ser hunerê ji Rûsî wergendiye ser zaravayê Soranî.



Hunermend Mihemed Arif (li aliyê rastê) bi nûçevanvanê Welat re.



Sê berhemên wênesaz Mihemed Arif: Keçika xîzan (li jor), Li Kurdistanê aştî (li milê rastê, li jor), Kela Dimdim (li milê rastê li jêr). Ev her sê wêneyên herî berbiçav in ku Mihemed Arif di hunerê de xêza realîzmê diparêze. Arif xebata xwe ya hunerî dide xuyan ku ji bo evîna bêsînor a welat didomîne û xwe heta mirinê şagirtê hunerê dibîne



(reşenivîs) û hin caran jî bi wêneyên ku min ew bi makîneyê kişandiye dikim. Ev ji min re dibin çavkanî û jêderk. Ev kar û bi hezaran karên min ên din tev ji bo xoşewîstî û evîna bêsînor a gel û nîştimanê min e.

Heke derfet hebe, hûn dixwazin pişengehekê li Bakur wek bajarê Amedê vekin? Ku ev tişt bibe, dixwazin çi tişt ji bo wan

diyarî bikin û nişanî wan bidin?

Ez jî dil û can ve li hêviya derfêke wisan im. Wekî tu jî dizanî ku, min pişengehên xwe li gelek welatên Ewropa û Ereban vekiriyê. Ger bi awayekî fermî (resmî) derfetek çêbibe ez dixwazim li Bakur jî pişengehên xwe çêbikim.

Diyariya min ji bo bajarê dêrin (Kevin) Amedê jî berhemên min î nû ne.

Komek nîgarên (portreyên) realîzmî û pêncî nîgarên rengîn, slayt û çend semînerên hunerî û dilê min e. Min tiştên zêdetir nîn e.

Ger ez ji we pişengeheke bi yek tabloyekê bixwazim, hûm dê kîjan tabloya xwe nişanî me bidin?

Bersiva vê pîrsê ne hêsan e. Ji ber ku tabloyên min ji dilê min derçûne. Lê ez

dibêjim tabloya Selahedîn Eyûbî (1967), an Kela Dimdimê (1978), an 12 Siwarê Meriwan, an Mem û Aysê, an projeya min a penc salên dawîn Senfoniya Çiyan... û hwd. Tu bibêji ez gişt tabloyên xwe bidim nişan.

Destanê Kurdî mîna Kela Dimdimê, Mem û Zîn, Las û Xezal, Kerr û Kulek û hwd. ku bi sedan rûpel girtine û gelek rûdaw (bûyer) tê de hene, hûn çawa dikarin destanêke wisa bi yek tabloyekê ku yek rûpel e vejînin?

Ev pîrs, pîrseke jîrane ye. Pêwîst e di destpêkê de wekî mirovê dildarê ku li nik dilbera xwe be, têkilî bi wan destanan re deyne. Bikeve hundirê wan, terz û felsefeya wan derbixe, di pey de teswîra wan bike.

Ez ji sala 1961'an ku li Moskovayê bûm ta niha, li ser destana Mem û Zînê dixebitim. Ji mêj ve ye ku, min deh reşenivîs (xêzên destî) çêkiriyê. Lê pêwîstî bi çend salên din heye ku, ez wan bikim tabloyên rengîn. Bi baweriya min divê li destana Mem û Zînê bi deh aliyan ve bê nihêrtin. Her şakareke (karê mezin) Kurdî lînerineke taybet divê.

Heke hunermend Mihemed Arif xwe bide naskirin pênasa wî çi ye?

Ez hez dikim ku, pênasa min tu bidî. Lê eger tu pîr hez dikî ku ez bidim, dibêjim ez heta bimirim qutabiyê (şagirt) hunerê me. Dildarê sirûştê herî rind ên welatê xwe û mirove Kurdperwer im. Min mirovê rasteqîn divê.

Qenciya huner û şarîstaniya cihanê li ser min û gelê min heye. Ji ber wê yekê, xoşewîstiya min ji bo gişt gelê cihanê ye. Lê li ber dergehê neteweya xwe wiha difikirim

Mihemed Arif çawa tarîfa şer û aştîyê dike?

Aştî: Xoşewîstî, afirandin, dilniyayî (rihetî) tîgîhîştina mirovahiyê bi firehî.

Şer: Malwêranî, derbederî, kuştin û temirandina pîroztiyên armancên mirov, berevajîya wateya mirovatî û huner.

Hevpeyvîn: Niwa Hebîb Wergerandina ji Soranî li ser zaravayî

Kurmancî: Niwa Hebîb û Zana Farqînî.

Pêşketina civaka Kurdistanê û azadiya neteweyî

Dr. Kemal Sîdo Kurdayî

Ji dema ku Tansu Çiller bûye sereokwezîra Tirkîyeyê û pê ve, dîsa gelek gotin li ser "pêşvebirina" civakî li "Başûrê rojhelatê Enedolê" têne ser ziman. Ne tenê nûnerên dewleta Tirk, belkî hinek Kurd jî alîkarê vê programê ne.

Gava Îro mirov li ser pêşveçûna civakî li Kurdistanê difikire, yekser pirseke girîng derdikeve meydanê; yanê dagirkerên Kurdistanê nemaze Tirkîye. Gelo tu berjewendîya xwe di pêşveçûna civaka Kurd de dibîne an na?

Ji bo ku mirov bersiva vê pirsê bide pêwîst e em vegezin ser dîroka Tirkîye û Osmanî. Wekî em dizanin gelê Balqanê û pêşî Yewnaniyan bêrî hemû gelên di bindestê dewleta Osmanî de serê xwe hildan û xwe rizgar kirin. Gelên Balqanê bêrî hemûyan dest bi serhildanên neteweyî kirin. Çimkî rewşa aborî, civakî û çandî ya wan li hemberî gelên din pirrtir bi pêş ve çûbû û li ser vê bingehê jî xwenasîna neteweyîya wan pêşketîr bû. Helbet gelek sebebên din jî hebûn, ewên ku kiribûn serhildanên wan zûtir dest pê bikin û bi ser bikevin. Lê bi bîr û bawerîya min faktorên girîngtir sebebên hundirîn bûn. Piştî ku komara Tirkîyeyê hatibû avakirin ev rastî jî aliyê Tirkan ve jî eşkere bûbû. Weke ku tê zanîn M. K Atatürk gelek caran li ser vê yekê bi rewşenbîrên Tirk re peyivîbû. (Utkan Kocatürk, Atatürk'ün fikir ve düşünceleri, Turhan Kitabevi, Ankara 1984s. 148-149)

Gava mirov hinek berhemên nivîskarên Tirk der barê Kurdistanê de dixwîne wisa diyar dibe ku, Tirk bêhiş û ehmeq in. Lê bi rastî ew ne wisan in. Ew xwe wisan şanî mirov didin. Bi şeweyeke giştî Tirk dîroka xwe û ya gelên Cîhanê baş dizanin û li gor berjewendiyên xwe yî Pantirkîst bi kar tînin. Yanê dibe ku Tirk şaşîyan dikin. Lê di pirs-girêka Kurdistanê de heya roja îro wan şaşiyên mezîn û xeternak nekîrîne. Di şerê li dijî tevgerên gelên bindest de Tirk zîrek û xwedî tecrûbeyên mezîn in. Di vî warî de dewleta Tirk ne bi tenê hov e, lê belê jîr, xwedî taktîk û pîrr fêlbaz e. Divê Kurd vê rastiye qebûl bikin û pê ve baş mijûl

bibin. Dema mirov deng û behsên bakurê rojavayê Kurdistanê yê rojane dixwîne belkî ev rastî baştir diyar dibe. Ez dixwazim bibêjim ku, Tirk berrî elektrîkê jî "Başûrê rojavayê Enedolê" di "Anadolu Ajansi" yê de li dinyayê belav bikin, ew pîrr qenc û xerabiya vê nûçeyê didine ber hev. Wekî ku Rûs dibêjin ew "Deh caran dipîvên û carekê dibirin." Lê gelek Kurdên me beryî ku bipîvin ew dibirin. Yanê Kurd pîrr zû ji nûçeya "Anadolu Ajansi" yê bawer dikin û belkî li ser bingeha "nûçeyên Tirkan" taktîk û stratejiya xwe jî ava dikin. Ew Kurd jî bîr dikin ku, cengên îro ne tenê di

roj bi roj bêhtir dibin. Ji ber vê yekê hikûmetên dagirker dê tu gavan li Kurdistanê neavêjin ku, ew gav bi kêrî Kurdistanê be.

Yek caran dijmin li Kurdistanê hin tiştên "pêşketî" an jî çend sozan dide Kurdan. Eger mirov li wan tiştan rind temaşe bike pîrr zû dibîne ku armanca van karên dijmin bi vê şeweyê an bi wê şeweyê lédana têkoşîna rizgariya neteweyî ye. Sozên dijmin berrî her tiştî dikarin di nav Kurdan de parçebûnê pêk bînin. Parçebûn jî bi xwe mezintirîn zîrarê digihîne xebata gelê Kurd.

Bi bîr û bawerîya min her

Kurdistanê de ji ber xwe û ji berê de nazik bûne. Ez mîna-kekê binim: Henga mirov dibîne ku sotandina Şirnexê û bombebarankirina Agiriyê li cem hinek Kurd wekhev e û ew guhdarî li nûçeyê dikin, wek ku ew bûyer li dawîya dinyayê pêk hatibe. Ev "wekhevûn" tiştê ne xwezayî (normal) ye û pîrr jî bi zîrar û xeternak e. Ez dixwazim bibêjim ku dijminê azadî û serxwebûna Kurd di vî warî de qenc bi pêş ve çûne, belkî bi ser jî ketibin.

Bûyerên ku, li cîhanê dibin nemaze li Yugoslavayê û li Yekîtiya Sovyeta Berê careke din îspat kirin ku ji suvêrênite-


distanê mafê Kurd heye bibêje ku "ben Kürdüm" (ez Kurd im). Helbet xwendevanên hêja jî baş dizanin ku dewleta Tirk ne bi hêsanî ev maf da Kurdan. Ji bo ku Kurd bikaribin bibêjin, Bijî biratiya Kurd û Tirkan pêwîst bû pîrr mirov têtetina zîndan an hilperikîna serê çîyan.

Demokratî jî bo Kurd berrî her tiştî divê wek azadiya neteweyî bê fêmkirin. Demokratiya li Tirkîye, Iraq, Îran û Sûriyeyê tu carî jî bo Kurdan nabe demokratî, ta ku Kurd nikaribin hebûna xwe ya neteweyî bi serbestî bi pêş bixînin û serdariya xwe bi xwe bikin. Bilî wê jî roja ku zehfî Kurdan xwestin welatê xwe ji dewletên din cihê bikin pêwîst e ev maf jî parastî be. Eger Kurd demokratiyê wisa fêm nekin, dê pîrr carên din jî bèn xapandin. Carekê Kurd bûn misilman beryî ku zanibin û karibin îslamê têxin xizmeta pêşvebirina civaka xwe. Careke din jî gelek Kurd bûn sosyalist û komünist û li ser rîya komünistên Tirk, Erebi û Faris bûn xizmetkarên dewletên Tirkîye, Iraq, Îran û Sûriyeyê.

Di rojên îro de jî, Kurd gelek li ser demokratî û pluralîzmê "stran" dibêjin. Çawa di demên pêşîn de li ser Hz. Mihemed mewlûdê dixwendin û kilam li ser Lenîn û Mao digotin.

Ez dixwazim bibêjim ku pîrr tiştên xweşik û rind li cîhanê hene. Lê pîrr mixabin mirov nikare bi hêsanî her tiştî bi dest bixîne. Di dawîya dawîn de pêwîst e ku, Kurd bi Kurdî biramin, bi Kurdî li cîhana derdora xwe temaşe bikin û dema ku tiştê jî Meke, Moskov an jî, ji Washingtonê tînin Kurdistanê, ji bo ku li wir karibe bijî û bikeve xizmeta Kurdan ew tişt hewceyî "Kurdkirinê" ye.

Ez naxwazim bi bîr û bawerîya xwe bi xwendevanên birêz û hêja "şîrîn û rind" bikim. Lê wek çawa min ji cîhanê fêm kiriye Kurd pêwîst e wisa bikin ku her tişt têkeve xizmeta azadiya neteweyî. Xebat ji bo azadiya miletekî wek Kurdan karekî bi rûmet, pîroz û dibe mirovayetî bi xwe be. Ta ku gelê Kurd di bin zilm û sîtema neteweyî de be, gund, bajar, dar û berên çîyan bèn sotin, mirovayetî û pêşverûtiya Kurd bê Kurdayetî temam nabe.



qada şer de lê belê meydanên di medyayê de (radio, TV, rojname...) jî bi "germî" tên domandin. Pîrr zor e ku mirov bibêje ka kîjan ji bo serketinê girîng e.

Tirk, Iraqî, Farisî û Sûrî dizanin ku, tîbûna azadiyê li ba Kurdan wek hemû gelên bindest pîrr mezîn e. Hiştîna Kurdan di binê zor û sîtema neteweyî de ne tiştê xwezayî ye. Ez bawer dikim ku, kêm Kurd hene, ewên ku naxwazîna rojekê zûtir azad bibin. Lê astengî ew e ku, piraniya Kurdan hîna ne hazir in ji bo azadiyê xebatê bikin û berdêla rizgariyê pêşkêş bikin. Dijminên azadî û serxwebûnê baş dizanin ku, ev rewş ta her dem berdeyam nake. Kurdên serbestiyê dixwazin û amade ne ji bo wê fidekariyê jî bikin,

çiqas sozên dijmin mezîn bin jî pêwîst e Kurd, tu carî van sozan bi parastina yekîtiya Kurd re nekin mēzîne. Çimkî parastina yekîtiya Kurd, miifta çarelêkirina Pirs-girêka Kurdistanê ye. Ev gotin ne bi tenê ji bo parçeyeke welatê me ye, lê ji bo hemû parçeyên Kurdistanê ye.

Bi sedsalan e ku Kurd bindest e. Û hebûna wî di tengasiyêke mezîn de dibore. Cihêti di nav parçeyên Kurdistanê de gelek mezîn bûne. Carinan Kurd mîna biyaniyan li hev dinihêrin. Rewşa neteweya Kurd zor dijwar û sext bûye. Bi ser van faktorên jorîn de dema şer jî di nav parçeyên Kurdistanê de derdikeve cihetî û biyanîti di nav girsê gel de zêdetir dibin. Pêwendî di nav parçeyên

ta (serdestî) neteweyî baştir tu formên din, ji bo gelek wek Kurdan, nas nake. Di vê dawiyê de zehf li ser demokratiyê tê axaftin. Tê gotin ku demokratî di dewletên dagirker de dikare bibe garantiya (misogerî) pêşketina çandî ya civaka Kurdistanê. Rast e di dîrokê de ta roja îro, ji demokratiyê baştir tu formên din nehatine ku, civat tê de qencir bi pêş bikevin. Helbet divê neyê jî bîrkirin ku, demokratî wek tēgînên (terîm) din ne yekrengî ye. Yanê demokratiya Tirkan, Almanan û Îngilîzan ne weke hev e.

Ji bo gelê Kurd ewê mafê wî nîn e bibêje ku ew Kurd e û jê re qedexeyê çanda xwe bi pêş bixî, demokratî divê çawa bê fêmkirin?

Îro li bakurê rojavayê Kur-

“Li ser....”

Seyît Çiya

Hinek tişt jiyane dixemilînin. Ev xeml, li gorî mirovan û li gorî çanda wan diguhere. Jiyana li axa Rojhilatê wek helbestekê ye. Helbestek bêserî û bêbinî... Jiyana li vir xwe seranpê xemilandiye. Xema evîn, keser û kul, gul û bilbil bi hev re dîrokê neqîşandine.

Dema mirov li rûpelên dîroka Rojhilatê dinêre, ev hinek jî tê fêmkirin. Ji bo hinek neteweyan dîrok qediyaye, ji bo hinekan jî didome, ji bo hinekan jî, ji nû ve dest pê dike.

Rojhilat, nivîsîna dîroka xwe neqedandiye. Li vê axê jiyana wek aveke bi hêz ku bend û dîwarên xwe tera kiribe, hê jî, ji xwe re riyekê nedîtiye û weke çemekî ser-serî li nav newal û deştan digere. Bi ser kele û qesran re dibihure. Sekna li ber vê lehiyê beyxûde ye. Carek tovê azadiyê ketiye sînga Rojhilatê. Rojhilat weke volkan, qîr û jehra dilê xwe dipijiqîne ser çavên dîrokê. Erd û esman, dil û mejî, xwe paqij dikin ji kirêti û jehra zorê.

Wek gul, gulên sor ku ‘bêhn didin dor’.

....ROJ Û ŞEVÊN...

Roj û şev wek jiyane ye. Ya pêşî hişyarî, ya din xew e. Roj di çanda me de sembola aşî, berekê û delaliya welatê me ye. Şev, di çanda hemû gelan de çavkaniya xerabiyê ye. Îro ji bo hinek qewman, roj û şev gihîştine hev ku, Kurd jî di nav wan de ne.

Nivê hişê me bi xerabiya şevê, nivê din jî bi ronahiya rojê xemilandiye. Wek ku Zerdeşt gotibû: “Li axa me şerê ronahî û tariyê didome”.

Lê, wek ku me gotibû îro li ser esmanê Medyayê tîrêjen rojê, tariya şevê diçirîne. Hişê me hêdî hêdî ji tariya şevan derdikeve. Şovalyeyên Nînovayê, di destê wan de şûrên ji polaya ronahiya Herekol û Qendilê, perdeya tariyê ku, li hişên



Lê, evîna wê ji çavên xezalan xweşikîr û ji bejna wan delaltir e.

mirovên me geriyaye, diqetînin.

Çirîskên ku ji êrîşên wan diavêjin, agirê Adarê geş dikin. Dengê meşa ronahiyê, dengê lingên tîrêjen rojê, wek straneke îlahî li erd û esman belav bûye.

Belê, roj û şev wek jiyane ne. Roj û şev, li welatê me wek jiyana me ne.

...EVÎNÊ...

Evînen mezin, incax di dilê mirovên mezin de şîn dibin. Ji bo wan xweşikahî, ne di sûretên xezalan de ye. Ew di dilê evîndaran de ye.

Evîn di xwezaya însên de, pejna (hisiyata) herî bilind e. Mirov evîne bi wate dikin û bi evîne bilind dibin.

Û evîna herî bilind, evîna niştiman e. Niştiman dibe ku erdekî beyar, an jî çolekî rût be, dibe ku behreke bêbinî, an jî çiyayekî bêserî be.

Lê kesera wê, ji çavên xezalan xweşikîr û ji bejna wan delaltir e.

Ji ber wê ye ku, evîndarên niştimanê, xwe ji serê çiyayên bêserî diavêjin sînga wê.

...Û...

Di dîroka şaristaniyê de nehatiye dîtin ku, qewmekî heta dawiyê di bin postalên zilmê de jiyaye û zilm her dem payîdar bûye.

...CENGÊ...

Li gorî A. Tonnybee, ji bo miletek felaketa herî mezin ew e ku, dîroka wî bi destên neyarê wî bê nivîsandin. Ev gotin çiqas jî rewşa me tîne ber çavan?


Lê Tonnybee, ew dîroknivîsên Medyayê li çiyayên welatê wan bidîta, wê bigota: “Ji bo miletek felaketa herî mezin ew e ku, dîroka wî ya bi pênuşa neyar hatiyê nivîsîn, bi lûleyên tîfîngên zarokên wî neyê guhertin”.

Belê... nivîskarê Latîni Eduardo Galleno, “Li ser şev û rojên evîne û cengê” nivîsîbû. Ew jî, ji qewmekî mezlûm û ji dîrokeke tarî hatibû. Lê, bayê şûrê di destê Che de û ronahiya zarokên Latîn, li ser axa xwe tovên serhildanan çandibûn...

...Wek bayê şûrê destê serevîndarê Egîr û wek roj û şevên şervanên di sînga welêt de.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Filîstîn û Kurdistan

Em dikarin bibêjin ku, hemû şoreşên azadiyê li her derê cîhanê dişibin hev û ji gelek aliyan ve jî, ji hev cuda ne. Bi taybetî şoreşa Filîstîn û Kurdistanê ji gelek aliyan ve wekî hev in. Herdu şoreş jî li hemberî dagirkerî, zilm, zorî û qetlîama dewletên faşist û şovenîst in ku, piştî xwe bi her awayî ve dane cîhanê û destek û alîkariya wan. Lê bi ferqeke pîrr mezin û girîng ku, ew jî ev e: Dewleta Îsraîl medenî ye, dewletên ku Kurdistanê dagirkerine hov û barbar in.

Ev niv qirn e ku, şoreşa Filîstînê didome. Bi sed hezaran jin, zarok, pîr û kal hatin kuştin. Talan, qetlîam, texrîbatên wehşî û mezin, sehneyên drama-

Bi taybetî şoreşa Filîstîn û Kurdistanê ji gelek aliyan ve wekî hev in. Herdu şoreş jî li hemberî dagirkerî, zilm, zorî û qetlîama dewletên faşist û şovenîst in ku, piştî xwe bi her awayî ve dane cîhanê û destek û alîkariya wan. Lê bi ferqeke pîrr mezin û girîng ku, ew jî ev e: Dewleta Îsraîl medenî ye, dewletên ku Kurdistanê dagirkerine hov û barbar in.

tîk çêbûn. Lê belê tu demê sehneyên xedar, barbar, xwînxwar ên wek Kurdistanê lê çenebûne.

Di 10 9 1993'an de bi aşî û lihevhatîna Îsraîl û Filîstîn dev ji şer û cenga texrîbkar berdand. Li ser maseya dîplomasiyê, aşiyê rûniştin. Lê ne bi rewşeke baş û la-

îqê şoreşgeriyê. Belkî bi rewşeke kêmasî û serberjêrî ji bo gelê Filîstînê re.

Lewre bihayê ewqas xwîn, ewqas ceng û şer diviya ku, azadî bûya. Ne niv serbestî û xweserî (otonomî). Lê dîsan jî wek serkeftin (zafer) tê jimartin. Di vê niqteyê de em dikarin bibêjin ku aqûbet li serê Kurdistanê be jî. Belê ne bi kêmasî, niv azadî; bi tevakî, bi şeref û serfirazî... Bîr û baweriyaya me ew e û wê ew be jî. Ji bilî wê tu rê û bijarî nayê hişê mirov.

Bi rastî gelek çewtiyê şoreşa Filîstînê çêbûn. Lewre jî ku, bi tam azadiyê encam neda. Girîngiya wan çewtiyan ew bû ku, ji şoreşa cenga çekdarî bêhtir piştî xwe dan dîplomasiya împeryalizmê. Bi alîkariya biyaniyan xapiyan. Lê belê dibe jî ku, di demên hatî de, di cenga dîplomasiyê de bigihîje hinek encamên tazetir û girîngtir.

Şoreşa Kurdistanê di vê xisûsetê de tu çewtî nekiriye û nake jî. Bîr û baweriyaya wê tim bi wê hebûye û heye jî. Nêzîkahiya xwe ya ji bo dîplomasiyê di hêz û qeweta xwe ya leşkerî û cengaweriyê de dîtiye û dibîne. Her wiha der barê şerrawestî, aşî û dîplomasiyê de jî.

Binevşa Narîn

Lokman Polat

(Serpêhati)

Di malbata wî de hemû jê re digot bavê Narînê. Wî navê keça xwe Binevş danîbû, lê jê re digot Binevşa Narîn. Ji keça xwe pîr û pîr zêde hez dikir, digot; "Narîna min" û li serê, rih û can dida. Wî Binevşê bi delalî xwedî kiribû, mezin kiribû.

Binevş, mezin bûbû û wek bavê xwe bûbû welatparêzeke baş. Diçû dibistanê, mamosteyê wê û hevalên wê jê hez dikirin, qedr û qîmet didan. Binevş keçeke jîr û zana bû. Keç û xortan li derdora xwe dicivand, ji wan re qala meseleya neteweyî ya Kurd dikir, di nav gel de dixebitiya, wan şiyar dikir. Xebat û têkoşîna wê ya siyasî wek striyê di çavê dijmin de diçûn.

Di Newrozê de, agirê azadiyê wê pêxistibû, bi şahî Newrozê pîroz kiribû. Di nav gel de li pêş meşîya bû. Dijminê xwînxwar di Newrozê de, li herêma Botanê, li Cizîrê, Şîrnexê, Nisêbînê gelê Kurd qetil kiribû, bi sedan kesên welatparêz hatibû şehîdkirin. Piştî Newrozê, polîsan Binevşê girtibû, avêtibûn zîndanê.

Dilê bavê wê xuşûş bû, ev bûbû çend roj ku, Narîna wî girtibûn û tu hisek, xeberek jê tune bû. Bavê Narînê zanibû, dijmin zû bi zû Narîna wî bernade. Tirsek di zikê wî de bû û ji xwe re digot; "Ev dijminê zalim dê keça min,

Narîna min di bin îşkenceyê de bikuje." Nan di qirika wî de nedîçû xwarê, tim û tim his û aqilê wî li ser keça wî bû.

Piştî girtina Binevşê hefteyek derbas bûbû, polîs hatin bang kirin bavê Narînê, jê re gotin bi me re were hetanî qereqolê. Tepîni bi dilê wî ket, êdî dizanibû ku wan keça wî kuştiye û niha wî dibin cenazeyê keça wî didinê. Pê re ji ber xwe ve, hêstiran di çavî de kire xwarê. Da pey polîsan, bi wan re çû qereqolê. Li wê derê jê re gotin; "Keça te întixar kiriye, xwe bi destê xwe kuştiye." Li ser vê gotina polîsan wî kir hewar û qîrîn, ji polîsan re got: "We keça min kuşt, hûn qatilê wê ne. Ew ji bo çî xwe bikuje." Polîsan jê re gotin: "Wê xwe kuştiye û me ew biriyê defin kiriye gorê."

Bavê Narînê: "Hûn çiqas zalim in, xwînxwar in. Bêxembera min, hûn çima wê dibin dikin gorê. Ez qet bi we bawer nakim, lê em bibêjin ku, ew xwe bikuje jî, divê we xeber bidana min û termê wê teslîmê min bikirana. Ka bibêjin we keça min li ku kiriye gorê, divê ez wê derxim, bibim mizgeftê wê bişom û meleyê mizgeftê terqîna wê bike."


Bavê Narînê çend roj xebitî, çû û hat. Bi zor û du belayan cihê gora keça xwe hîn bû. Ew bi qefleke girseyî ve çû gor vekirin, mêze kirin ku, Binevşê bi kincên wê ve avêtine gorê. Ew derxistin, anîn mizgeftê ku wê bişon. Xwedêyo çî bibînin.

Neynokên destê wê û lingê wê hemû kişandibûn, du tiliyê wê bi birekê jê kiribûn, sînga wê bi kêr û cilêtan qelişandibûn, yek memika wê ji binî ve jê kiribûn. A din jî, ji nîvî de qelişandibûn. Ecêp û sosret anîbûn serê wê. Li rûyê dinyayê bi tu kesî bi vê tewrî îşkence nehatibû kirin, bi zinditî goştê wê ji laşî we jê kiribûn. Gel gava vê wehşetê dît, li hember dijmin kîn û nefreta wan pîr zêde bû.

Polîs û timên taybetî, gava ew girtibûn û biribûn, kiribûn zîndanê, li wê derê îşkenceyê giran pê kiribûn. Lê ew qet neaxivîbû. Navê tu hevalekî xwe nedabû. Li dijî dijmin bi qehremanî (lehengî) ber xwe dabû. Ew ji dijminê xwînxwar netirsîyabûye û qet bersiva pirsên wan nedaye. Gava lê dixistin, pê îşkence dikirin, nedikirin, hewar, qîrîn û gazin, ji devê wê gotin dermediket. Ew jî wek mîrxasê bêhempa, lehengê zîdana Amedê, eynî wek Mistê Avarêş bêdeng dima û dijmin qehr dikir.

Polîsên îşkencekar digote wê: "Ka bibêje, we çek û fişengan li ku veşartîye, kî bi gerîlan re alîkarî dike? Di komîteya gel de kî cih girtiye, navê wan ji me re bibêje? Ew ên ku bi şev bi sîleh û bi roj bi kuleh in kî ne, navê wan bibêje."

Lê Binevşê navê tu kesî negot û bersiva wan neda. Polîs digotin wê: "Ewên li çîya terorîst in, mîrkuj in." Binevşê: "Na, ew şerkerên rizgariya



welat in, ew azadîxwaz in."

Polîsan, neynokên wê dikşandin, elektrîk didan laşê wê û jê re digotin: "Çerî gerîlayan bike, yê wan û dê û bavê wan bide. Emê bi te îşkence nekin." Binevşê: "Hay ho, hay ho, ew gerîlayên serê çîya, rih û canê min in, ez çawa çêran li wan dikim, qey hûn dîn bûne. Hûn dizanin ji bo gelê Kurd gerîla çî ye?"

Polîs: "Na, ka bibêje me, gerîla çî ye?" Binevşê: "Gerîla şan e, şeref e, xîret e, namûs e, hevî ye."

Wê gava wiha got, polîs wek kûçikan har bû û lêda. Hestiyê pozê wê û parsûyên wê

şikandin. Ev lêdan û îşkenceya nedîtî hefteyek berdewam kir û paşê polîsan mêze kiribûn ku ji devê wê tu xeberek nastînin, roja heftan ji timên taybetî yekê zalim gulleyek berdabû serê wê û paşê wê bi cilê wê ve biribûn, çalêk kolandibûn û avêtibûn pê ji malbata wê re gotibûn, "Ew xwe kuştiye."

Li mizgeftê piştî ku Binevşa Narîn, şûştin, kefen kirin û ew birin kirin nav gorîstana şehîdan, bi termê wê re gelê Kurd bi girseyî meşiyabû. Li ser gorê, hevalên wê li ser jîyan û têkoşîna wê axiviyan û ji bo hemû şehîdên Kurdistanê rawestiyan.


XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1-Navê mebusê bajarê Mêrdînê yê DEP'ê ku di 4'ê İlonê de ji aliyê kontra ve li Batmanê hate kuştin. Di wêneyê de tê dîtin 2-Kinçek ku ji hiriyê tê çêkirin/ Notayek/ Di rêziman de pêşgirek, bi alîkariya wê ji lêkerekê, lêkerekê din tê çêkirin/ Yadê 3-Mişext/ Bextiyarbûn 4-Med, asik, mîde/ Bi zimanê devkî bilêvkirina cînavka 'min'/ Dengvedan 5-Eyarşîrk/ Rihet, basît 6-Cînavkek ji desta yekemîn a yekehejmarê kesê yekemîn/ Navê bizina nêr 7-Baneşanek 8-Dapitîn, taşin/ Qertafek ku tê pêşîya peyvê û jê nav û rengdêr tê çêkirin 9-Navê celebek hermiyan 10-Navê nexweşînekê ku ji celebek mîşe çêdibe û li rûyê mirov şopa xwe dihêle/ Ferzeke dînê İslamê

Serejêr: 1-Navê aletek ku pê kolanê dikin/ Aşê ku bi dest tê xebitandin 2-Pêxwas/ Navekî mîran 3-Navê demsalekê/ Hicûm 4-Şair/ Di îskambîlê de 'yek' 5-Peywir, wezîfe/ Bi zaravayê Dimilî qertafeke neyîniyê/ Av an jî xwarina ku xwêya wê zêde ye 6-Di desteya duyemîn a cînavkan de, cînavka kesane ya duyemîn/ Notayek/ Çem, robar 7-Ji hevîr tê çêkirin û bi pîrranî ji aliyê keç û jinan ve tê birrîn 8-Navê rêxistineke İrlandî/ Ji êzing û tiştên ji bo şewatê re tê gotin 9-Kuçeya kor ku mirov jê nikare

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												



derkeve 10-Di argoyê de baneşanek 11-Navekî zilmînan 12-Cihê ku mirov tê de peya an jî siwar dibore

BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ

Çeperast: 1-Mele Muhyettîn 2-Aram/ So/ Nan 3-Sê/ Pastel 4-Art/ Aso 5-Bask/ Ew/ Nîr 6-Vî 7-Ar/ Sot 8-Roj/ Tore 9-Ëvar/ Ta 10-İran/ No

Serejêr: 1-Mast/ Narê 2-Erê/ Rovî 3-La/ Tav/ Jar 4-Em/ Sîr/ Ra 5-Pak 6-Uşar/ İso 7-Hoste/ Oran 8-Wate 9-Ene 10-Talan 11-İn 12-Sor

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Li Tirkîyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeye pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas

Han 16 Kat:3 No:301 Çağaloğlu / İstanbul

Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
3 meh	60.000	30 DM
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Kêza kêzxatûn, xwedî şimikên reqreqûn

Hebû nebû rehme li dê û bavê me û we bû. Hebû gundekî kêzikan. Di vî gundî de kêzikeke bi tenê hebû, kesekî wê tune bû. Navê wê Kêzxatûnê bû. Havîn çû zivistan hat, baranê lê kir, kêzikan xaniyên xwe bangeran kirin ji bo dilopan. Xaniyê Kêzxatûnê dilop kirin, derket ser serê xanî ku ew jî bangeran bike. Kir û nekir hingî giran bû nikaribû bi tenê bangeran bike. Dev jê berdide dadikeve xwarê hundir, rûdine û ji xwe re digirî. Cîrana wê bi dengê giriyê wê dihesse tê hafa wê dibêje: "Kêzxatûn çima tu digirî, çi hewalê te ye?" Kêzxatûn kesereke kûr dikişîne dibêje: "Ez im kêza Kêzxatûn, şimika reqreqûn, keziyên gulavdûn, heval û hogiran ez hiştim û çûn." Cîrana wê got: "Kêzê ma wisa dibe? Tu bi ya min bikî rabe ji xwe re mêrekî peyde bike." Kêza min û we radibe daw û delinga xwe hil dide, dide serê rê û diçe.

KÊZXATÛN Û BILÛRVAN

Di rê de leqayî şivaneke dibe, gazî dikê dibêje: "Wa şivano! Bilûrvano, navmil pano, serê kêzê bi qurbano, tu min ji xwe re nakî kevanî?" Şivan dibêje: "Belê ezê te bibim." Kêzê jê dipirse: "Gelo gava kela te rabe tê bi çi li min bixî?" Şivan dibêje: "Ezê bi darê xwe yî şivantiyê li te bixim." Kêzê dibêje: "Wî li min porkurrê, wele



ez te nakim." û diçe.

Nêzîkahî li gundê mişkan dide, li ser benderê leqayî kerekî tê, deng li ker dike, dibêje: "Wa kero, hefsar zero, zînê ji zêr li sero, elba ceh li bero ma tu min ji xwe re nakî bermalî gelo?" Ker dibêje: "Belê ez te ji xwe re tînim." Kêzê jî ker jî dipirse ka gava jê aciz bibe wê bi çi lê bixe, ker dibêje: "Ezê te di bin simê (ling) xwe de biperçiqînim" Kêzê aciz dibe ji wir direve û dibêje: "Wî li min dûzanê! Wa kero ne zînê zêrîn li sero, kurtan li sero, silek gû li bero."

KÊZXATÛN Û MIŞK

Kêzê çû serê gund, vê carê jî leqayî li mişkekî tê, jê re dibêje: "Wa pismamê mişk, tu min ji xwe re nabî gelo?" Mişko qebûl dike. Kêzê jê dipirse gelo gava jê aciz bibe wê bi çi lê bixe. Mişko jê re dibêje: "Ezê bi serê qemçika xwe li te bidim." Kêfa kêzê tê dibêje: "Tam tu li gorî min î, were em herin

mala xwe." Radibin têne mala kêzê. Kêzê derdê xwe jê re dibêje. Mişko dibêje: "Xemê nexwe, ezê vêga herim ser xanî bangeran bikim." Mişko dertê serê xanî bangeran dike; dilopên kêzê disekin, kêfa kêzê tê, çavên mişko maçî dike. Ew roja wan derbas dibê dinya xweş dibe, dibê tav. Kêzê dibêje: "Mişko wele cilên me gemarî bûne divê em herin ber çem beravê bikin" Mişko radihêje teştê cilan dide ser piştê xwe, Kêzxatûn jî dide pêşya xwe û diçin ber çem. Kêzê çav bi çem dikeve ditirse, dibêje: "Wî! Wele ev çem pîrr mezin e, ez newêrim li vir cilan bişom." Mişko wê dibe ber goncaleke (kortik) ku ji şûna piyê hespê tije bûye ava baranê. Ji kêzê dipirse: "Ev der çawa ye?" Kêzê dibêje: "Ev der li gorî min e." Kêzê radibe sê keviran dike kuçik ji xwe re, sîtila beravê dide serê, avê germ dike. Mişko dibêje: "Kêzê tu

berava xwe bike, ezê herim nav gund daweta mala axê ye, ezê ji xwe û te re goşt û birinc bînim.

MIŞKO DIÇE DÎLANE

Mişko diçe dawetê kêzê jî satila xwe li avê dixê ku tije bike lingê wê dişemite tevî sîtilê serserî di avê wer dibe. Bi sobaberiyê jî nizane ku, xwe xelas bike û dike hawar. Dinêre siwarek ji wir ve tê, dibêje: "Wa siwaro! Tu bi ku ve diçî?" Siwar dinêre nanîhêre tu kesî li dor xwe nabîne, lê dîsa jî bi aliyê deng ve dibêje: "Ez diçim daweta mala axê." Kêzê dibêje: "Ku tu çûyî dawetê gazî bike bibêje; wa mişko mişkawirro, diran çirro, kêza Kêzxatûn, şimika reqreqûn, keziyên gulavdûn, ketiye golê wê bixeniye." Siwar hema zû diçe dikeve nava govendê û bi dengê bilind gazî dike dibêje: "Mişko mişkawirro, diran çirro, kêza Kêzxatûn, şimika reqreqûn, keziyên gulavdûn, ketiye golê wê bixeni-

qe." Gava mişko dengê siwar seh dike, xwe sil dike guhdarî û hema dibêje: "Bi Xwedê ev kêza min e, ketiye avê ez herim wê xelas bikim." Tê dinêre ku, wa kêzê di nav gola avê de dike nake nikare xelas bibe.

MIŞKO KÊZÊ LI ERDÊ DIXE

Mişko dûvê xwe dirêjî nava avê dike, kêzê xwe pê digire û dertê. Dibêje: "Mişko zû em herin malê li min sar e" Lê hingî cemidiye nikare bimeşe. Mişko wê datîne ser qoqlîka stûyê xwe û dikevin rê ku herin malê. Hingiya kêzê serma girtiye mîza wê tê, xwe ranagire û bi stûyê mişko ve mîz dike. Mişko dibêje: "Kêzê ev çi ye piştê min şil bû" Kêzê dibêje "Wî fir mîzîn e, xem tunîn e." Mişko dengê xwe nake bi riya xwe ve diçe. Piştî sê çar gavan kêzê vê carê xwe ranagire pê ve nava wê diçe. Mişko dibêje: "Kêzê vê carê ev çi ye? Ez ji bîne fetisîm" Kêzê dibêje: "Hin gûyîne xem tunîn e" Kela mişko pîrr radibe û kêzê li nivê erdê dixê û dev ji kêzê berdide û diçe. Kêzê şerpeze dibe, nikare bimeşe here malê, nexweş dikeve û li wê derê dîsa Kêzxatûnê bi tenê dimîne û dimire.

Çiroka me çû nav deviya, rehme li dê û bavê me hemûya.

**Berhevkar:
Rûken Baxdû**

Dengê hiş, mejî û wîjdanê

Mehmed Uzun

Niha gava ez vê kurtenivîsa ku ez bi hinceta xelatên rojnamevan û nivîskarê kal û delal, apê Kurdan Mûsa Anter dinivîsim, dilê min dîsa bi şewat e. Apê Mûsa di tariya şevê de, di kuçeyeke teng û bêdeng de, li Diyarbekirê hate kuştin. Niha ji mêrkujên çavsor û rûş hevalê delal, parlamenterê Kurd ê DEP'ê, însanê jêhatî Mehmet Sincar kuştin. Eynî mîna kuştina Apê Mûsa, Mehmet jî qetîl kirin; di kuçeyekê de, bi berikên tarî û neyar, bi xayînî û hovîti. Lewma bêhna min teng, dilê min bi liyan e.

Berî niha bi demekê jî, 37 nivîskar, şair, hunermend û ronakbîr, li bajarê Sêwazê, li ber çavên bi hezaran kesan şewitandin.

Li Tirkîyeyê, bêwest û rawest, xwîn diherike. Bêhna xwînê bi ser Tirkîyeyê ketiye. Li Tirkîyeyê wehşet, zor û zordarî bûne serdest. Tirkîye bûye welatê jan, keser, dîni û hovîtiyê. Û tiştê ku herî zêde mirov pê xemgîn dibe jî ev e: Zordaran bîr û baweriyên xwe yê kirêt bi civatê dane qebûl kirin. Civata Tirkîyeyê jî hêdî hêdî wehşet, zor û zordariyê qebûl dîke û welê bawer dîke ku, mesele û pirsên civakî û neteweyî dê bikaribin bi zor û zordarî, bi şewat û kuştinê çareser bibin.

NIVÎSKARÊ KESERKÛR

Îro li Tirkîyeyê, kesên ku karên dewletê digerin, bi kêfxweşî û mexrûrî behsa hejmara mirî û kuştîyan dikin û welê bawer in ku, gava ew hin pirrtir mirov bikujin, problem, gelş û pirsên Tirkîyeyê, nemaze yê neteweyî û siyasî, dê çareser bibin. Dengê karbidestan, ne dengê mejî û wîjdanê ye. Zîhniyeta ku hê îro jî hebûna Kurdan nas nake, huwiyeta Kurdî nabîne, hê jî, ji Kurdên Tirkîyeyê re (ku hejmara wan jî 20 milyonan zêdetir e) radyo û televizyoneke Kurdî, xwendin û perwerdehiya bi zimanê zikmakî pirr dibîne, bêsîk ne dengê hiş û wîjdanê ye. Diyar e ku, tu pêwendiyên mejî û wîjdanê bi zîhniyetên wiha re nîn e. Ev nêrîn û zîhniyet, dengê zor û zordariyê, dengê dîni û şaşiyê ye.

Musa Anter, nivîskarê kal û keserkûr ê Kurdan her tim bi xurtî li dijî dengê zor û zordariyê ku, her bi qîreçîr e, derket û li hember vî dengê çewt ew bû dengê nerm ê mejî û wîjdanê. Di gel ku pirrî caran hêjahî û giranbuhayiya lebat û xebatên wî nehatin dîtin û famkirin, di gel ku zor û zordariyê pirrî caran nefes lê çikand, di gel ku hertim rê lê hate girtin...

Çiqas derd, kul û misîbetên ku dikarin bi serê ronakbîrekî Kurd de werin, bi serê Musa Anter de jî hatin. Ew her tim hate eşandin û perçiqandin, hemû rê û derî lê hatin birrîn û girtin. Kete girtîgehan, îşkence dît, xebat û berhemên wî yê edebî û çandî hatin talankirin, bi tenê hate berdan. Lê wî ne dev ji huwiyeta xwe ya neteweyî, ne jî dev ji hezkirina însanan berda.


Wî her gav rexne li siyaseta resmî ya Tirkîyeyê ku, li dijî Kurdan dimeşîne girt û vî siyaseta mîna siyaseteke nerast, bêmejjî û bêwîjdan dît û bi nav kir. Û wî her xwest ku, Tirkîye hê ku wext heye û dereng nebûye dev ji vî siyaseta xwe ya bêkêr û bêmane berde û bi riyên medenî, mafên neteweyî, demokratîk û însanî yê Kurdan bide.

Çiqas derd, kul û misîbetên ku dikarin bi serê ronakbîrê kî Kurd de werin, bi serê Musa Anter de jî hatin; ji ber huwiyeta wî ya Kurdî, ew her tim hate eşandin û perçiqandin, bi şexsiyeta wî hate listin, hemû rê û derî lê hatin birrîn û girtin. Kar û şixulên ku wî dikaribû

bikirana, jê hatin standin. Kete girtîgehan, îşkence dît, xebat û berhemên wî yê edebî û çandî hatin talankirin, bi tenê hate berdan. Lê di gel van hemû nexweşî û kirêtîyan, wî ne dev ji huwiyeta xwe ya neteweyî, ne jî dev ji hez û hezkirina însan û însanîtiyê berda. Haya wî jî mezinahî û bilindahiya exlaqî û wîjdanî ya kar û xebatên wî hebû. Ew bi heq bû û li ser rîyeke rast bû. Bi vî dîtin û baweriyê, ew bi sebra Eyûb û bi metaneta Mûsa xebitî. Li gorî wî Tirkîye welatê jan û dîniyê,

pût û pûtperestan bû. Doraliyê Tirkîyeyê, bi qedexeyan ve hatibû rapêçandin. Lê tevî vî, wî jî Tirkîyeyê hez dikir. Ji ber ku gelê Kurd ku wî jî hebûna xwe zêdetir jê hez dikir, li ser van axan dijiya. Heta nefesa xwe ya dawî jî, ew ji bo wekhevî, biratî

mezin bi gir û di kaşekê de gêr bike û lat derxe ser lûtkeyên gir. Lê gava ew lat derdixwe ser gir, wê hengê lat ji aliyê din ve ber bi jêr gêr dibe û dere. Sîsyphos divê careke din, bi sebr û metanet, rahêje lat û wî hilkişîne jor. Careke din, careke



din... Karê wî her wiha berde-wam e. Karê wî, cezayê wî ye. Lê ew vî cezayê ne-aqlî û ne-wîjdanî, bi heş, ezim, sebr û xebat-kariya xwe di-qulipîne ser karekî hêja û giranbuhê. Xweda û mirov êdî bi rêz û rêzdarî li sebr, ezim û xebatkariya wî dinihêrin. Ew bi ser dikeve û karê wî êdî kêfxweşî û serfiraziyê didiyê. Kar û şixulên Mûsa Anter jî, kêfxweşî û serfiraziyê danê. Ew di xizmeta

gelê xwe yê mezlûm de bû, wî ziman, huwiyet û çandê bîndest û perçiqî diparast, lê xwedî derdiket û ji bo wê dixebitî. Di demeke ku êdî herkesî digot: "Bi Kurdî gotinek jî nayê nivîsîn", wî şanoya xwe "Bîrîna Reş" bi Kurdî nivîsî û ferhengê "Kurdî-Tirkî" anî pê û ew yadgarî gelê xwe kirin. Wî nivîsar û berhemên xwe bi gotin, stran, wêje û zargotina Kurdî neqîşandin. Wî bi serfirazî ev gavên pêşîn avêtin. Ma ji gavên pêşîn û pêşengiya demên nû xweştir, serfiraztir û

û serfiraziya gelên Kurd û Tirk xebitî.

XÎZMETKARÊ GELÊ XWE

Albert Camus di ceribandîneke xwe ya edebî de behsa yek ji navên nêrînê mitolojiya Yewnanan Sîsyphos dike û pesnê hest û daxwaza Sîsyphos ya jiyane, kî nî nefreta wî ya li dijî mirinê û bêhnfirehî û nefsiçûkiya wî ya li hember zor û zordariyê dide: Sîsyphos ku xwedayên wê demê xezebên mezin lê kirine, mehkûmî cezayê mezin bûye. Ew divê latekî

rindtir tiştêkî din heye?

Van xebat û gavan, dil û mejiyê wî bi dewlemendiya xweşî û bedewiya ruhî vegirtin. Wî jî mîna Sîsyphos, kevîr û latên giran, di gel her zehmetî û bêçaretîyê, hêdî hêdî hilkişandin gopik û lûtkeyan.

DILDARÊ TÊKOŞINA AZADIYÊ

Dîsa Camus, di kurtegotara xwe ya Stocholmê de ku gava Xelata Nobelê werdigire bi hinceta xelatê, li ser berpirsiyariya nivîskar û ronakbîran radiweste: "Nivîskar dikare xwe di nav civat û komeke bi heq û jîr de bilebîfîne. Ev jî bi tenê dikare bi van herdu berpirsiyariyên ku mezinahiya hunerê tînin pê, bibe: **Rastî û Azadî**. Karê hunermend, perwerdeyî û berhevkirina girseyên gel e, lewma jî ew nikare bibe hevalbendê/a kolektî û derewan..." Mirov pirr bi rihetî dikare bibêje ku, nivîskarî, rojnamevanî û jiyana ronakbîrî ya Mûsa Anter ji kolektî û derewan pirr bi dîr bû. Wî li hember kolektî û derewan, rastî û azadî parast, doza mafên huwiyet, ziman, çand û hebûna Kurdan kir û ew xwestin. Tirkîyeyê demokrat ku tê de azadî û serbestî ne luks in, dil kir. Wî bi dil û can têkoşîna van tiştan kir.

XELATA MUSA ANTER

Ji ber vî yekê jî, ev xelatên bi navê wî û ji bo bîranîna wî (ku ez jî di heyeta jûriya wê de me) niha tînin dayîn gelek girîng in. Nav û bîranîna Mûsa Anter divê were jiyandin û car bi car vejandin. Mirov divê hewl bide ku, berhem û xebatên wî yê ronakbîrî hertim zinde û nûjen bimînin. Prensîb û qaydeyên wî yê jiyana, nivîskarî û rojnamevanîyê divê hertim li ber çavan bin da ku ev nîşan nû jê kelk (sûd, feyde) werbigirin. Hem jî di Tirkîyeya îroyîn de pirr pêwîstî û hewcedarî bi wan heye. Lê belê ev xelatên rojnamegeriyê ne bi tenê ji bo van tiştan girîng û di cih de ne, her wiha ew ji bo ev tiştên jêrîn jî pirr girîng in: Ji bo protestokirina ew dest, tilî û zîhniyeta bêwîjdan û xayîn ku nivîskarekî kal ê 76 salî, di tariya şevê û kuçeyeke teng de, didê ber gulleyan û di nav xwîna sor de dihêle. Ji bo parastina mafê jiyana mirov û azadiya wî ya fikrî. Ji bo parastina daxwazên bi heq ên neteweyî û demokratîk ku, Kurd lê dozê dikin û Mûsa Anter jî têdikoşiya. Ji bo daxwaza wekhevî, biratî û yekîtiya Kurd û Tirkan û ji bo Tirkîyeyê ku tê de toleran û aşî heye û hemû însan xwedî mafên xwe yê bingehîn in... Ji bo van hemû tiştan xelatên Mûsa Anter girîng in.

welat

- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.